# Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ — SAL: 1 HEJMAR: 24 — 30 AVRÊL 1995 — BUHA:40.000 TL(KDVD)


### Parlementoya Kurdistanê li Rûsyayê

Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt dest bi têkiliyên dualî kir. Heyeteke PKD'ê ji bo ku bi parlementerên Rûs re hevdîtin û têkiliyan deynin, çûn Moskovê. Heyeta PKD'ê, bi Parlementoya rûs a bi navê Duma'yê re ketin têkiliyên dualî.

Rûpel 2

### Zarokên Koma Gulên Mezrabotan:

Em zarokên kurdan bi dilgeşiyeke mezin zarokên dinê silav dikin. Em bang li hemû xwişk û birayên xwe dikin; bila li dijî vî şerê qirêjî ku li welatê me dom dike, derkevin. Em zarokên kurdan in, em zarokên welatê ku gundên wî tên şewitandin, çiyayên wî tên bombekirin in. Em jî dixwazin wekî zarokên dinê bextewer bibin.

Rûpel 16

### Koma Azad: 'Şîn û şahiyên me ketine nava hev'

Ji 90'î bi şûn ve di piyaseya Unkapaniyê de her kesî rabû kaset çêkirin. Ên ku ziman zanibûn, nizanibûn, bi kurdî kilam gotin. Di rewşeke wiha de me nexwest em bi serê xwe kaseteke çêkin. Ji ber ku xebatên me ne şexsî ne, em ji xeletiyan tirsîn.

Rûpel 12

### Şer ji Başûr ber bi Bakur tê

Di geliyê Uxartê ku li mintiqeya Helkiz a Sasonê ye di navbera hêzên dewletê û gerîlayan de li gelek deveran şer derket. Gerîlayan di van şeran de cerdevanên gundê Kuramlı û Xerdelê xistin kemîna xwe. Di kemînê de 5 cerdevanên gundê Kuramê û 2 cerdevanên Xerdelê mirin.

Rûpel 10



SEROKÊ PARLEMENTOYA KURDISTANÊ YA LI DERVEYÎ WELÊT YAŞAR KAYA:

# PARLEMENTOYA LI DERVE VÎNA GEL TEMSÎL DIKE

- Serok Parlamentoy Yaar Kaya, ji Gnay Aslan re li ser pdiviya avab-na parlementoy xebatn peyiv rewa gel kurd bi ya ber re muqayese kir.

- Gel kurd, bi sedsalan ji aliy kesn din ve bi awayek pir xerab mecbr darekirin bye. L d gel me dixwaze qedera xwe bi dest xwe biguherne li welat xwe bi awayek azad, bibe xwediy soz qeraran.

- Parlementoya me, bi nrn niyeteke vekir hembza xwe ji hem hzn welat me yn oreger, demokrat ji geln ku li Kurdistan djin re, vekir. Me dil heb ku ew dostn me j di nava xwe de bibnin. L bila b zann ku me der li wan negirtiye, ji bo wan me kontenjan veqetandiye.

Rûpel 8-9




*Roja 24'ê Avrêlê Rojnameya Welat, 26'ê Avrêlê jî Rojnameya Welatê Me li DGM'ê bû*

## KURDÎ DÎSA LI MEHKEMEYÊ BÛ

Roja 24'ê Avrêlê Rojnameya Welat, 26'ê Avrêlê jî Welatê Me li DGM'ê bû

# Zimanê kurdî dîsa li mehkemeyê bû

**Di nava hefteya borî de li mehkemeyên Tirkiyeyê du dozên (daweyên) balkêş hebûn. Her çiqas ev balkêşî ji bo medyaya tirk tu tiştan îfade neke ji, ji bo gelê kurd û kultura wî pir girîng bû. Xwediya rojnameya Welatê Me Aynur Bozkurt: "Zimanê kurdî li gorî qanûn û nîzamnameyên dewleta tirk, zimanekî ku 'jê nayê fêmkirin e'. Lê dewleta tirk îro ji ber berjewendiyên xwe yên navneteweyî, çav li weşan û rojnameyên kurdî digire."**

Di 24'ê mehê de li Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DED) doza rojnameya Welat ku di sala 1994'an de weşana xwe sekinandibû, hebû. Berpirsiyarê Karê Nivîsaran Mazhar Günbat, ji ber nivîsa "wahşeta dewletê didome" hate mehkemekirin. DED li gorî "Qanûna Têkoşîna li dî Terorê", benda 8/1 û 7/2'yan girtina rojnameyê jî di nav de, der heqê Günbat de bi salan ceza dixwaze

Piştî vê mehkemeyê, di 26'ê mehê (avrêlê) de doza Welatê Me li eynî mehkemeyê hebû. Di vê mehkemeyê de jî eynî ceza hatin xwestin. Lê ev doz berê ji benda 7'an hatibû vekirin û li gorî vê bendê, pesindana rêxistina "terorê" yanî PKK'ê hatiye kirin. Heyeta mehkemeyê ev xal guherand û li gorî benda 6'an wê mehkeme çêbibe. Li gorî vê bendê jî cihdayina weşan û şîroveyên rêxistina "terorê" wê doz bê vekirin. Di vê dozê de tiştekî balkêş jî hate dîtin ku dozger daxwaza girtina Berpirsiyarê Karê Nivîsaran ê berê yê rojnameya me Mehmet Gemsiz kir. Lê ev daxwaz ji aliyê heyeta mehkemeyê ve nehate qebûlkirin, mehkeme ji bo parastineke zêde hate texîrkirin. Di 1'ê gulanê de wê dîsa mehkeme ji bo qerarê danişe.

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran Gemsiz ji ber nivîsa ku di hejmara me ya 4'an de bi navê "Zêdeyî 500 kes hatin kuştin" tê darizandin. Di eynî dozê de xwediyê rojnameya me Aynur Bozkurt jî tê darizandin.

PARASTINA BIKURDÎ Û PÎVANA DUBER A DED'ê

Di mehkemeya 24'ê mehê ya rojnameya Welat de tewra heyeta DED'ê û tewra eynî heyetê ya li hemberî doza Welatê Me ne yek bû.

Di mehkemeya Welat de, DED'ê ji Berpirsiyarên Karê Nivîsaran Mazhar Günbat xwast ku ew bi parêznameya nivîskî parêziya xwe bike, wekî tê zanîn, ji roja ku mehkeme li ser nivîsên bikurdî hatine vekirin û heta îro, hemû parêzî bi kurdî dihatin kirin. Lê ji bilî carekê, ew jî bi dû re qebûl nekirin, parêznameya bi kurdî di mehkemeyên tirk de nedihat qebûlkirin. Piştî vê biryarê, di 26'ê mehê di xwediyê rojnameya Welatê Me Aynur Bozkurt û Berpirsiyarê Karê Nivîsaran yê berê Mehmet Gemsiz, gava xwestin parêziya xwe bi kurdî bikin, heyeta mehkemeyê gote ku ew ji qestî û wekî tewreke siyasî bi kurdî parêziyê dikin. Li gorî heyetê her du kes jî bi tirki dizanin, lê ew naxwazin bi tirkî xwe biparêzin.

Wekî li jor hate diyarkirin, eynî heyetê ji bo Günbat parêznameya bi kurdî ya nivîskî xwestibû. Ji bo vê yekê mehkeme texîr kiribû, lê vê heyetê ji bo Welatê Me ne bi devkî û ne jî bi nivîskî parêzî qebûl nekir.

Li ser vê tewra mehkemeyê ebûqat Selim Okçuoğlu, bendên peymana Lozanê yên 39 û 40'î nîşan dan û diyar kir ku ji bo parêziya bi kurdî ev bend dikarin wekî mînak bên qebûl kirin.

Tiştê ecêb ew e ku mehkeme, li ser nivîsên ku bi kurdî hatine weşandin dozê vedike, van nivîsan werdigerîne tirkî, lê ne zimanê kurdî qebûl dike (carinan qebûl dikin) ne jî xweparêziya bi devkî û nivîskî ya bi kurdî qebûl dikin, lê ji bo ceza danê vî zimanî qebûl dikin.

**SUUT KILIÇ**



**Li ser navê Rojnameya Welat Mazhar Günbat xwest ku dîsa bi kurdî xwe biparêze.**

# Li Rûsyayê Parlementoya Kurdistanê

Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt (PKD) dest bi têkiliyên dualî kir. Heyeteke PKD'ê ji bo ku bi parlementerên rûs re hevdîtin û têkiliyan deynin, çûn Moskovê. Heyeta PKD'ê, bi Parlementoya rûs a bi navê Duma'yê re ketin têkiliyên dualî û di 24'ê avrêlê de li ser van hevdîtinan, civîneke çapemeniyê li dar xistin. Civîn bi beşdariya parlementerê Partiya Demokrat a Lîberal M. Burlacov, parlenementerê Partiya Komînst a Rusyayê Pertovsky, Parlementerê serbixwe K. Arakaçaa û ji PKD'ê jî Şerefê Asuryan û Rustemê Biroyî hate çêkirin.

Di civîna çapemeniyê de ku li parlementoya Rusyayê dihat çêkirin, li ser navê PKD'ê mebûs Rustem Biroyî axifî. Biroyî, di axaftina xwe de diyar kir ku PKD, encama şerê gelê kurd ê pazde salan e û ew hemû kurdan temsîl dike. Der barê çareserkirina pirsgirêka kurdan de mebûs Biroyî ev got: "Parlementoya me, dixwaze pirsgirêka kurdî bi riyên aştiyê çareser bike. Me ev daxwaz gelek caran da diyarkirin. Hemû dewletên ku bi pirsgireka kurd re eleqedar in, divê bi me re dialog û goftûgoyan çêkin."

Li dû axaftina Biroyî, parlementerê serbixwe yê rûs Arakaçaa peyivî, wî di axaftina xwe de bal kişand ser naskirina PKD'ê. Li gorî wî, divêt hemû dewletên ku PKD lê heye, wê nas bikin. Di dawiya civîne de parlementere Partiya Demokratên Lîberal Burlacov, li ser rewşa jeopolîtika Rojhilata Navîn sekinî û bi taybetî qala rewşa Kurdistanê kir. Burlacov, axaftina xwe wiha qedand: "Herêma Rojhilata Navîn ji ber zengîniyên bin erdê û yên ser erdê, her wextî bala dewletên mezin kişandiye. Wan dewletan hergav bi awayekî li vê herêmê xwe nîşan dane.

Tirkiye, bi serê xwe başûrê Kurdistanê îşxal nekiriye. Li pişt wê, NATO heye. NATO, bi desteka Tirkiyeyê, dixwaza xwe bigihîne teniştа Rûsyayê. Me berê jî gotibû ku em naxwazin dijminatiya tu dewletan bikin, lê divê Tirkiye nebe aletê van polîtîkayan.

**Kurd–A**

# PKD'Ê TEVKUJIYA ERMENÎ Û SURYANIYAN LANET KIR

Bi munasebeta salvegera 24'ê avrêlê 1915' an, ku di vê tarîxê artêşa dewleta Osmanî bi milyonan ermenî, suryanî û kurd qetil kiribû, serokê Konseya Kargeriyê ya PKD'ê Zubeyir Aydar beyanatek weşand. Daxuyaniya ku me ji ajansa Kurd–A'yê stand, wiha ye: "Li Kurdistanê ji bilî kurdan gelê ermenî û asûrî (suryanî) jî dijîn. Di îşxal û perçebûna Kurdistanê de tesîr li gelê din jî bûye siyaseta ku dewletên kolonyalist li Kurdistanê ajotiye, gelek caran bûye sebeba şerê di navbera van gelan de jî. Di 1915'an de ev siyaset bûye sebeba xwînrijandineke pir. Dewleta Osmanî, di 24'ê avrêla 1915'an de bi fermanekê, dest bi qetlîam û nefikirina ermenî û asûriyan kir. Ji bo vê qetlîamê tevdîr û plan hatibûn amadekirin, ji nav kurdan jî Alayên Himêdiyê (cerdevanên îro) hatibûn hilbijartin. Di vê qetlîamê de bi milyonan ermenî, asûrî û kurd hatin kuştin û nefikirin.

Di vê sedsala ku em tê de ne (sedsala 20.) de ev siyaset, ji aliyê dewleta tirk ve tê ajotin. Carinan alewî û suniyan û gelek caran jî kurdan (bi sîstema cerdevaniyê) bi hev didin kuştin, wan bera pêxîla hev didin. Li hêla din, bi metodên piralî, li hemberî gelê kurd jenosîdê pêk tînin.

Dewleta tirk li hemberî gelen Anadoluyê wek şebekeya sûcdaran xebitiye, demografiya (rewşa nifûsê) wê guherandiye û bûye sebeba mirin û talankirina gelek kulturan. Ev siyaseta ku vê gavê li Kurdistanê tê ajotin. Em bala raya giştî dikişînin ser vê siyasetê û dixwazin ku ew bi baldarî van kirinan taqîb bikin. Îro, roja salvegera 80. a tevkujiya ermenî û asûriyan e. Bi vê wesîleyê, em êşa wan di dilê xwe de his dikin û lanetê li dewleta Osmanî û hevalbendên wê Alayên Hemîdiyê (serkêşên eşîrên kurdan) dikin.

**Kurd–A**




# Yeni Politika: Bisansur

Rojnameya Yeni Politikayê ji roja ku dest bi weşana xwe kir û vir ve, ji cerd, pêkûtî û sansûra dewletê nefilitiye. Di rojnameyê de nûçe û nivîsên ku hatine sansurkirin: 17'ê avrêlê nûçeya "Papa ji kurdan re dua kir." Ev nûçe di Hürriyet û Milliyetê de jî derket. Di wan rojnameyan de nehate sansûrkirin. 16'avrêlê nûçeya "Parlementoya Kurdistanê protesto kir." hate sansurkirin. Ev nûçe ji rojnameya Cumhuriyetê hatibû standin û bi eynî şiklî hatibû weşandin.

20'ê avrêlê nûçeya "Qedafî li pişta kurdan e" hatibû sansûrkirin. Cumhuriyet û rojnameyên din ev nûçe bê sansûr dan. 21'ê avrêlê nivîsa Ahmet Altan "Atakurd" di rojnameya Yeni Politikayê de hate sansurkirin. Ev nivîs 17'ê avrêlê di Milliyetê de bêsansûr derket. (Bi sedemê vê nivîsê Ahmet Altan ji karê xwe hate avêtin) 22'yê avrêlê nûçeya "Serokê PKK'ê Öcalan got: "Bila werin ba min, ne ba Clinton" û hin nûçeyen din hatin sansurkirin. Eynî nûçeyên Milliyet û Hürriyet bi navê "Apo: Ez ji Türkeş hezar caran zêdetir nêzîkî tirkan im" û "Apo di weşana neqlen de" dan û nehatin sansurkirin. Dewlet bi van pest û cerdên xwe dixwaze dengê çapemeniya dijber bibire.

**Navenda Nûçeyan**

## JÛJÎ

Doğan Güzel




**DIK**

## 'Mehmetçîk' parsê dike

Waliyê Amedê Doğan Hatipoğlu daxuyaniyekê dide û dibêje: "Ji bo operasyona li dijî PKK'ê divêt hemû karmend û karker beşdarî kampanyayê bibin." Piştî vê daxuyaniyê hemû saziyên fermî yên dewletê ji karmend, karker û xwendekaran bi zorê pereyan didin hev. Li gorî çarçova kampanyayê, divêt her xwendekar bi hindikayî 20 hezar bide. Piştî ku beşdariya kampanyayê hate mecbûrîkirin, komek mamoste ev yek protesto kirin. Li gundên Bismilê jî bi destê muxtaran ji gundiyan bi darê zorê pere tên topkirin.

Li Sêrtê û Êlihê jî karker û karmendan gotin ku ji bo kampanyaya "Mehmetçik" ji maeşên wan pere têne birîn. Ev birîn jî di navbera 250 û 100 hezarî de diguhere. Ev yek ne bi dilê wan e û bi talîmata walî tê kirin. Ji bo vê jî nikarin bisekinînin. Li gorî bîlançoya kampanyayê ku çapemeniya tirk da, ji bo Mehmetçik alîkariya herî hindik li bajarên Kurdistanê hatiye topkirin.



# 'Leşkerên tirk li Başûr diziyê dikin'

Leşkerên tirk ên ku li bakurê Îraqê (başûrê Kurdistanê) li cih bûne, malên kurdan talan dikin û dibistanên wan îşxal dikin. Ev agahî ji gundiyên kurd ên herêmê hatin standin

Jineke kurd a ji gundê Şanke, Samire Abdurahman di 21'ê avrêlê de anî zimên ku beriya deh rojan ji ber êrîşên balefirên tirk ji gundê xwe reviyane û piştî deh rojan dema vegeriyane, di şûna gund de kavil û wêraneyek dîtine. Samire Abdurahman gotinên xwe wiha didomîne: "Hemû malên me hatibûn xerakirin û bi temamî hatibûn şêlandin. Leşkerên tirk di malên me de betaniyeyeke biçûk jî nehiştibûn. Li gorî gotinên Samireyê, 2000 leşkerên tirk ên ku li mintiqaya wan bicihbûne, ji bo kamp û wargehên xwe çadir (kon) û betaniyeyên ku ji gundiyan dizîne, bi kar tînin."

Mêrê Samireyê, Abdirahman jî gotinên wê bi van hevokan teyîd dike : "Leşkerên tirk konên leşkerî bi kar nedianîn, wan, konên me yên spî ku di sala 92'an de Neteweyên Yekbûyî dabûn me, bi kar dianîn. wekî din wan betaniyên me jî, bi kar dianîn. Min ew bi çavên xwe dîtin."

Kurdên başûrî yên ji gundê Hîzawayê ji dan zanîn ku 2000 leşkerên tirk dibistana gundê wan veguherandine kampeke (wargeheke) leşkerî ji bo xwe.

Li gorî agahiyên gundiyên Hizawayê leşkerên tirk 500 heb zarokên ku ders didîtin, ji sinifên (polên) wan bi darê zorê avêtine.

Li aliyê din yek ji berpirsiyarên rêxistinên ku ji bo alîkariya mirovî li Başûr in, gote ku wî dîtiye ku çar heb erebeyên tijî leşker ketin nava bajêrê Zaxoyê, lê dema ew erebeyên leşkerî ji bajêr derketin sê heb ji wan vala bûn.

AFP

# RTÜK kete pey Televizyona MED'ê

Lijneya Bilind a Radyo-Televizyonê (RTÜK) bi raporekê giliya TV–MED'ê li wezareta derve kir. Li gorî endamê RTÜK'ê Esin Konanç TV–MED, ji aliyê PKK'ê ve tê fînansekirin. Endam Konanç îdia dike ku TV–MED ne li gorî qanûnên Îngilistanê hereket dike û ji bo vê yekê lazim e ku weşana wê bê sekinandin. Li Tirkiyeyê saziya RTÜK'ê wezîfeya sansurkirinê dike. Ji ber vê yekê gelek televizyon û radyoyên ku li Tirkiyeyê weşanê dikin, ji aliyê vê saziyê ve an hatine îqazkirin an jî hatine girtin.

Esin Konanç, di rapora ku ji wezareta derve ya Tirkiyeyê re şandibû de dibêje ku TV–MED, di nav hefteya borîn de bernameyeke siyasî, bi navê "GOTÛBÊJ" çêkir û di vê bernameyê de yekîtiya Tirkiyeyê bûye hedef, wekî tê zanîn di wê bernameyê de Serokê PKK'ê bangî Çillerê kiribû û gotibû ku ew ji bo çareserkirina meseleya kurd ji dêla ku biçe cem Bill Clinton, bila here ba wî.

Navenda Nûçeyan

## KURTENÛÇE...KURT

### ERNK li Danîmarkayê

Roja 25'ê avrêlê li paytexta Danîmarkayê li Kopenhagê ERNK'ê buroyek vekir. Di vekirina buroyê de gelek kes beşdar bûn û nêzîkî 20 rojnamevanî cih girtin.

Beriya ku bûroya ERNK'ê vebe balyozê tirk bi têkiliyên xwe yên dîplomatîk gelek xebat kir. Lê bûro hate vekirin, di vekirinê de nûnerê ERNK'ê Ali Akbaba axaftinek kir. Akbaba di axaftina xwe de got: "Pirsgirêka kurdan bûye pirsgirêkeke navneteweyî. Ji ber vê yekê pirsgirêka kurdan hikûmeta Danîmarkayê jî elaqeder dike. Gelê kurd wê dengê xwe bi vê yekê bigihîjîne gelê Danîmarkayê." Di daxwaza axaftina xwe de jî gote: "Komara tirk aştiya naxwaze û şer didomîne. Lê şer zirarê tenê nade gelê kurd, dide gelê tirk jî." Piştre Nûnerê Partiya Sosyal Demokrat Finn Rudaizky û nûnerê Mafên Mirovan yê Kurdistanê Jimmy Jensen axivîşn.

Kurd–A

### Vekişîna artêşa tirk

Artêşa tirk di 20'ê adarê de ketibû erdê başûrê Kurdistanê û îşxal kiribû. Roja 25'ê avrêlê rayedarên artêşa tirk daxuyandin ku 20 hezar leşkerê xwe ji Başûr kişandina û li wir nêzîkî 10–15 hezar leşker mane. Piştî demeke din wê hêzên xweyên din jî vekişînin. Lê, çavkaniyên herêmê û çavkaniyên ARGK'ê bi me didin zanîn ku artêşa tirk ne bi hêzeke 35 hezarî Başûr îşxal kiriye. Hêzên dagirker nêzîkî 75–80 hezar in û hê jî li Başûr nêzîkî 50 hezar leşkerên wan hene. Ev vekişîn jî ji bo ku pest û pêkûtiyên dinyayê nerm bikin, çêbûye. Tê zanîn ku piştî îşxalê dinyayê reaksiyoneke dijwar nîşanî Tirkiyeyê dabû û ji Tirkiyeyê derketina ji Başûr hatibû xwestin.

Navenda Nûçeyan

### Cendekê Serokê HADEP'a Elbîstanê hate dîtin

Roja 27'ê avrêlê cendekê Serokê HADEP'a Elbîstanê Hüseyin Koku li derveyî bajarê Elbîstanê hate dîtin. Wekî tê zanîn Hüseyin Koku beriya 6 mehan ji aliyê kontrgerîla ve hatibû revandin û tevî hemû hewldanên û lêgerînên nasên wî, nehatibû dîtin.

Li gorî agahiyên ku gihane destê me, roja pêncşemê li çoleke nêzîkî Elbistanê cendekekî peritî û bêhndayî ji hêla hin polîsan ve hatiye dîtin. Piştî lêkolînên ji bo tesbîtkirina nasnameya vî cendekî, hatiye diyarkirin ku cendek yê serokê HADEP'a Elbistanê Huseyin Koku ye.

Di van sê salên dawî de bi dehan rayedar û bi sedan endamên HEP, DEP û HADEP'ê hatine revandin û kuştin.

Welatê Me/Edene

Navên **10** kesên ku di xaçepirsa hejmara 22'an de peyva veşarî **'Kela Dimdimê'** dîtine û pirtûka **"Bexçeyê Vîşne"** qezenc kirine:

**Hikmet Manga**
**Ruha**

Seyfettin Söyler
Semsûr

**Hüseyin Arslan**
**Bursa**

Sinan Sütpak
Semsûr

**Ahmet Kanar**
**Midyad/Mêrdîn**

Kemal Bektaş
Stenbol

**M. Rauf Çiçek**
**Amed**

M. Cesur Sarıgöl
Enqere

**Brahime Erez**
**Buca/İzmîr**

Yusuf Altaş
İskenderun/Hatay

Xaça Sora navneteweyî li ser îhlalkirinên mafên mirovan yên li başûrê Kurdistanê sekinî.

# 'Li Başûr hebûna Kızılayê ne meşrû ye'

Berdevkê Xaça Sor ê Ewrûpa û Balkanan Chiristoph Girad da zanîn ku xebatên Kızılaya tirk ên li Başûr ne li gorî qanûnê navneteweyî ye. Wî got: "Kızılaya tirk li Başûr saziyeke bêqanûnî ye." Li gorî qanûnên navneteweyî, dema dewleteke derek îşxal kir, saziyên wê dewletê yên alîkariyê rawetiya xwe winda dikin û dibin saziyên îşxalê. Christophe Girad li ser vê yekê got: "Ji bo me (xaça sor) Kızılaya tirk piştî îşxalê ne saziyeke qanûnî ye û heqê wê tune li Başûr xebatê bike. TV' yên tirk her roj xebatkarên Kızılaya xwe dema nan, biskûwî, şekir û hwd. belav dikin, nîşan didin. Ev xebat ji bo veşartina îşxalê ye" Girad di dewama axaftina xwe de got ku pirsgirêka kurdan pirsgirêkeke navneteweyî ye. Di bûyerên navneteweyî de ji Xaça Sor pêştir tu sazî nikarin xebatan bidomînin. Ev yek ji bo Kızılaya tirk re naguhere. Girad got ku wan piştî nûçeya Yenî Polîtîkayê ya bi ser navê "cenazeyê endamên Kızılayê MIT hilda–MIT'ê ji Kızılay zaf hez kir" dest bi pirsiyariyê nûçeyê kirine. Li gorî dîtina Berdevkê Xaça Sor Girad, saziyên hûmanter yên wekî Xaça Sor û Kızılayê mecbûrin li gorî qanûnên navneteweyî û bi taybetî jî li gorî Konvansiyona Cenewreyê heraket bikin. Li gorî Konvansiyona Cenewreyê madeya 27'an Kızılaya tirk nikare li deverê ku artêşa tirk îşxal kiriye xebatê bike. Ev yek bi qanûnên navneteweyî hatiye qedexe kirin.

Li aliyê din hemû dewletên dinyayê alîkariyê didin saziya navneteweyî yên alîkariyê lê, li gorî dokûmanan Kızılaya Tirkiyeyê vê alîkariyê nade Xaça Sor a navneteweyî.

**Kurd–A**

# Rewşa girtiyan dijwar e



Li Girtîgeha Êlihê, ji ber cerd û zilmên rayedarên girtîgehê, girtiyên siyasî ji 5'ê avrêlê ve dest bi greva birçîbûnê ya bêmûdet kirine.

Li ser navê 230 girtiyên siyasî yên Girtîgeha Êlihê Zûbeyîr Bilen û Selahattin Kılınç daxuyaniyek dan. Di daxuyaniyê de gotin ku di girtîgehê de cerd û pest her diçe dijwartir dibe. Mafên girtiyên yên însanî tev de hatine xespkirin. Ev yek jî ji bo ku girtî bibin îtîrafkar, tê kirin. Daxuyanî bi gotinên, "Dema me dibin dadgeh û nexweşxaneyê di birin û anînê de heqaretên madî û manevî li me tê kirin. Heta vê gavê gelek hevalên me îşkence dîtine û ew îşkence bi raporên dixtoran jî îspatkirîne. Dixwazin me bi îşkence û pêkûtiyan bikin îtirafkar" didome.

Di dawiya daxuyaniyê de jî nûnerên girtiyan gotine: "Roja 17'ê avrêlê hevalên me Ahmet Çiftçi û Cihat Sever dema ji bo tedawiyê dibin nexwaşxaneyê li wan îşkence tê kirin. Û wan piştî îşkeceyan dixin hûcreyan. Hevalên me ji bo ku herin ba girtiyên siyasî, dest bi greva birçîbûnê dikin. Piştî vê yekê hevalên me bê tedawî bi paş ve tînin. Di hevdîtinan de maliyên me tên tehdîtkirin û piştî hevdîtinan tên girtin. Em ji kesên ku dibêjin em welatparêzên, demokrat in û însan in alikariyê dixwazin."


**Navenda Nûçeyan**






Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 24'an; pirtûka **"Gotinên Navdaran"** e. Ev pirtûk ji aliyê Firat Ceweri ve hatiye amadekirin û weşanxaneya NÛDEM'ê çap kiriye.
**Jêrenot:**
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

**Xelata Xaçepirse**




**"Gotinên Navdaran"**

www.arsivakurdi.org

## Hilbijêrên frensewî di hilbijartina serokkomarê Fransayê de dudilî ne

# Li Fransayê bêkarî hêviya mirovan dişkîne

Di van rojên hilbijartina serokatiyê de li Fransayê karker ji bo ku karên xwe winda nekin, kesên bêkar jî ji bo kar, xebatê dikin. Rêjeya bêkariyê ku gihîştiye % 13'an bandorê li xwendekaran jî dike û wan derdixe kolanan. Li vî welatî di 23'ê avrêlê de pêngava yekemîn a hilbijartina serokatiyê çêbû, di vê pengavê de berendamê sosyalîst herî zehf rey standin, lê heke berendamê sosyalîst Lionel Jospin biserkeve jî ew rewşa gel baştir nabe. Bi taybetî xwendekaran hêviya xwe ji partiyên heyî birîne.

Wekî mînak, Christian xwendekareke 19 salî ye, ew wiha dibêje: "Ji bo me tiştê herî girîng meseleya bêkariyê ye. Mirov çiqas baş hatibe perwerdekirin jî bandorê li mirov dike." Xwendekareke ji bajarê Nice dide zanîn ku hêviya wê tune ku piştî kutakirina dibistanê wê karibe kar bi dest bixe. Ew dibêje ku hemû berendam wekî hev in.

**"Ji bo me tiştê herî girîng meseleya bêkariyê ye. Mirov çiqas baş hatibe perwerdekirin jî bandorê li mirov dike." Xwendekareke ji bajarê Nice dide zanîn ku hêviya wê tune ku piştî kutakirina dibistanê wê karibe kar bi dest bixe. Ew dibêje ku hemû berendam wekî hev in."**

Hinek xwendekarên ku haya wan ji kevneşopa berê, ango bûyerên 1968'an heye didin zanîn ewê reyên xwe bidin berendamê komunîst Robert Hue, hin kesên ku hêviya xwe ji sosyalîstan birîne jî didin zanîn ku ewê dengên xwe bidin partiyên hîn radîkal, wekî berendama Têkoşîna Karkeran Arletta Laguiller ku wê di hilbijartina 1988'an de % 1.99 rey girtibû. Divê bê gotin ku bêhêvîbûn hinek kesan ber bi partiya Le Pen'ê ve dibe. Ew kes hebûna biyanan wekî sedema bêkariyê dibînin.

Xwendekarên fransiz li karên nelirê giliyan dikin û dixwazin rê li ber bê girtin. Dîsa hinek didin zanîn ku ji ber dubendiya navbera çepgiran rê li ber rastgiran vedibe. Piştî ku encama pêngava yekemîn derket holê, Serokwezîr ê rastgir Edouard Ballador daxuyand ku ewê pişgiriyê bide Jacques Chirac. Wisa dixuye ku wê 7'ê gulanê di pêngava duyemîn de Jacques Chirac




**Gelê fransiz li hemberî polîtîkayên hikûmetê livbaziyan li dar dixe, ew doza jiyaneke baş dike.**

bibe serok. Chirac wekî mirovekî oportunîst tê binavkirin. Derdorên siyasî ferqa sosyalîst û muhafezekaran wiha nîşan didin; "kesên ku tiştekî bikin" û "kesên ku tu tiştî nekin."

Niha êdî wisa bûye ku Fransa wekî "civaka hêvîşikêr" tê bi navkirin, ji ber ku dahata welêt bi giştî zêde dibe, lê rewşa kedkaran xerab dibe. Êdî karker jî hêviya jiyaneke baş nakin, lê belê ji bo parastina tiştên di dest de xebatê dikin. Tê gotin ku ew problem bi sîstemê ve girêdahî ye.

**Encama pêngava yekemîn a hilbijartinê:**

Lionel Jospinê Partiya Sosyalîst: %23.2

Jacques Chirac'ê Partiya Guallîst: %20.5

Edouard Balladorê Partiya Guallîst: %18.5

Jean Marie'ê Le Pen'ê: % 15.3

Robert Hue'yê Partiya Komunîst: %8.64

Arlette Laguiller'a Partiya Troçkîst: % 5.3

Philippe de Villersê neteweperest: %4.74

Dominique'yê Keskan %3.32

Jacques Cheminade'ê serbixwe: % 0.28

**Samî Berbang**

## Di êrîşên artêşa rwandî de bi hezaran hutu hatin kuştin

# Li Rwandayê tevkujî

Leşkerên Neteweyên Yekbûyî (NY) li kampê penaberan ê Kibeno roja 23'yê avrêlê cendekê bi hezaran kesî dîtin. Li gorî rayedarên NY'ê hejmara kesên ku hatine kuştin nêzî 8 hezaran e. Li gorî agahiyhên ku bi dest ketin li vî kampî ku li başûrê rojavayê Rwandayê dikeve, gelek hutu bi destê artêşa Rwandayê hatine kuştin. Li vî kampî 80 hezar kesên ji qebileya hutuyan diman. Tê gotin ku di nava kesên ku hatine kuştin de gelek jin û zarok jî hene. Li gorî çavdêran gelek jî birîndar bûne. Rayedarên NY'ê ku li wir xebatê dikin dan zanîn ku leşkerên Artêşa Welatparêz a Rwandayê ku piraniya wan tutsî ne, dor li kampê hutuyên ku li welatê xwe bûne penaber girtine, ji lew re ew nikarin birîndaran derman bikin. Li gorî nûçeyan roja 22'yê avrêlê leşkerên Rwandayê kampê penaberan dane ber guleyên topan û tevkujî bi vî awayî çêbûye.



**Leşkerên Rwandayê du zarokên ku hatine kuştin ji naştinê dibe.**

Xebatkarên NY'ê piştî ku Serokê Rwandayê kamp ziyaret kir û hejmara hutuyên ku mirine wekî 300 kes nîşan da, belavokeke bêîmze belav kirin û tê de hejmara miriyan wekî 2 hezarî nîşan dan. Serokê Rwandayê Pasteur Bizimangu îdia kir ku kesên hutu yên çekdar di nava girseyê gel de provokasyon pêk anîne. Rayedarên Rwandayê lê dixibitin ku hutuyên penaber bi dorê zorê vegerînin malên wan. Hutu jî hewl dide ku ji kampan birevin û xwe bigihînin welatên cîran.

**Nûçeyên Derve**

# Xaça Sor dîsa Tirkiye îqaz kir

Xaça Sor bi delagasyonekê bala Tirkiyeyê kişand û jê rîayeta qaîdeyên navnetewî xwest. Berpirsiyarê Xaça Sor ê Ewrûpayê Francois Musy daxuyand ku Tirkiye dixwaze xabatên wan ên li başûrê Kurdistanê bide sekinandin. Musy, di dewama daxuyaniyê de got ku Tirkiye çiqas zehmetî û dijwariyê derîne ber wan jî, ewê xebatên xwe bidomînin. Ji bo vê yekê jî wan heyetek şandiye û rewşa Başûr ji aliyê heyetê ve tê çavdêrîkirin. Berpirsiyarê Xaça Sor Musy di dawiya daxuyaniyê de wiha dibêje: "PKK'ê peymana Cenevreyê û peymanên li wê zêdekirî, qebûl kirine. Îro li başûrê Kurdistanê cengek heye, lê Tirkiye vê yekê qebûl nake." Berdevkê Xaça Sor Reneluc Tavoz jî li ser mijarê got: "Artêşa tirk nahêle ku çapemenî û saziyên navneteweyî bikevin herêmaşer. Bi vê yekê jî kirinên xwe yên li dijî sivîlan vedişêre. Lê ji ber pesta raya giştî ya navneteweyî, artêşa tirk mecbûr ma ku me bihêle herêmê. Tê zanîn ku îşxalê roja 20'ê adarê dest pê kir, lê incex em 11'ê avrêlê ketin herêmê. Ji ber cerd û pêkutiyên artêşa tirk, gelek gundiyên kurdan dev ji gundên xwe berdane û bi herêmên din ve çûne."

**Nûçeyên Derve**

# Yewnanîstanê jî ambargo xwest

Li Yewnanîstanê ji aliyê parlementerên çar partiyên siyasî ve, roja 10'ê avrêlê li hikûmetê banga vetoya peymana komara tirk û Yekîtiya Ewrûpayê hate kirin. Parlementeran di pêşniyaznameyê de wekî sedem qetlîamên komara tirk yên li ser gelê kurd û îşxala başûrê Kurdistanê, nîşan dan.

Di pêşniyaznameya parlementerên yewnanan de ev tê gotin: "Em parlementerên ku îmzeya me li jêr e, îşxala Kurdistana Başûr protesto dikin. Endîşeya me ev yek e ku, ev sûcê komara tirk (qirkirina kurdan) bêceza bimîne. Bêdengiya dewletên Ewrûpa û yên din jî endîşeya me rast dike. Em jî hikûmeta Yewnanîstanê, ji bo ku Tirkiye ji Konseya Ewrûpa bê derxistin û peymana ku bi Yekîtiya Ewrûpayê re bi mebeseta yekitiya gumrukê îmze kiribû, bê vetokirin, xebatan dixwazin. Û ji têkoşîna vê neteweya herî kevin re piştgiriya xwe eşkere dikin."

Parlementerên ku pêşniyaznameyê îmze kirine 73'yên PASOK'ê, 5'ên Partiya Bihara Nû û 4 jî jiPartiya komûnist in. Di pêşniyaznameyê de gotina "Kurdistana Başûr" bal kîşand ser xwe.

**Kurd–A / Welatê Me**

www.arsivakurdi.org

# FAL

**BERAN (21 Adar – 20 Avrêl)**

Hûn welatparêzekî/ê jidil in, lê mixabin kesên li derûdora we bi tirşikperweriya xwe nav dane. Ji ber vê yekê xelk bi wî çavî li we dinêre. Dema agir bi dehlê ket, ter û hişk bi hev re dişewitin, loma divê hûn xwe ji wan kesan û wî navî bişon.

**GA (21 Avrêl – 21 Gulan)**

Hûn li nava dost û hevalan pir xwe dipesinin, lê dema qala hêzên dewletê dibe nava we diqete, bêhna we diçike. Wekî bav û kalan gotine:" An nekin nelerizin, an jî bikin nelerizin." Ji xwe re cotek solên nû bikirin.

**CÊWÎ (22 Gulan – 21 Pûşper)**

Li hemberî meşîna karên hinek hevalên we, hûn heyirî dimînin. Tevî ku bi tu tiştî nizanin, dîsa jî her dem bi ser dikevin. Tê gotin ku aşê nezanan Xwedê digerîne. Jixwe şansê we tuneye, piyê xwe li piyên wan kesan negirin.

**KEVJAL (22 Pûşper – 23 Tîrmeh)**

Hûn zehf tiştan difikirin, lê nikarin wan bînin ziman. Jixwe bêyî dev, gotin nayên tev. Heke hûn nikarine fikrên xwe vebêjin wan binivîsin û ji ber bikin. Bi vî awayî wê axaftina we bi pêş bikeve.

**ŞÊR (24 Tîrmeh – 23 Gelawêj)**

Hûn suxreyan li mirovan bar dikin, lê dest navêjin berîka xwe. Ji bîr nekin ku çiraya bêdon rohniyê nade. Di rojeke pîroz de kavirekî serjê bikin, li cîranên xwe belav bikin. Meha pûşperê ji bo we bixêr e.

**SIMBIL (24 Gelawêj – 23 Rezber)**

Hûn xwe wekî mirovekî/e pir bihenek û qerfok dibînin, carinan jî hûn zêde pê de diçin. Henek hin caran dibin genek, vê gotinê ji bîr nekin. Çavên xwe ji kulman biparêzin û hay ji xwe hebin.

**MÊZÎN (24 Rezber – 23 Kewçêr)**

Bi pey tiştên derbasbûyî nekevin, roja çû ava, careke din nayê. Hinekî li ser herikîna ava çeman bihizirin. Xwe ji agahiyên çewt ên çapemeniya tirk biparêzin. Bi rêk û pêk xebitîn riya serfiraziyê li ber mirov vedike.

**DÛPIŞK (24 Kewçêr – 22 Sermawez)**

Bi dîtina we divê mirov tiştê ku ji bo xelkê kiriye, nede rûyê wan, ew nêrîneke çak e, lê ji bo her kesî û li her derê ne rast e. Hin caran wekî kalikên me gotine: "Pir bike, lê ji bîr neke." Ji derdê evînê xwe biparêzin.

**KEVAN (23 Sermawez – 21 Berfanbar)**

Hûn di karûbarên xwe de pir dikevin nava dudiliyê. Heta ku di karekî de serkeftin garantî nebe, hûn xwe nadin berê. Ew jî dibe sedem ku gelek derfet ji dest we biçin. Hin caran şeva xweş di mexrebê de xuya ye, hinekî cesaret.

**KARIK (22 Berfanbar – 20 Rêbendan)**

Dibêjin:" Kesê xebitî nexelitî." Tevî ku hûn di karê xwe de pir biezmûn in jî, hûn bi sernakevin. Ew jî ji ber bêeleqebûna we ye, divê hûn hinekî zêde bala xwe bidin karê di dest xwe de. Cilên xwe yên nû ji ber tavê rakin.

**DEWLIK (21 Rêbendan – 11 Reşemî)**

Pirî caran hûn xwe naçar dibînin ku bi ser bikevin, dema nagihîjin doza xwe jî hûn xemgîn dibin. Ew dîtin ne rast e û tu caran jî pêk nayê, ji lew re divê hûn dev jê berdin. Kar û zerar birayê hev in, her tim serkeftin çênabe.

**MASÎ (20 Reşemî – 20 Adar)**

Hûn beredayî ji roma reş dilovaniyê dipên. Zilma wê serê wê bixwe, wê bêyî darê zorê guh daye tu kesî? Divê hûn ji bîr nekin ku bextê romê tuneye. Ji xwe re malekê ava bikin, koçberiya we mala xelkê şewitand.




# Çûna heyvê û Stilîlî

Mûsa Anter ji Stenbolê rojekê tê Stilîlê. Gundî tên cem, xêrhatinê tê didinê. Ji xwe re dipeyevin. Tiştan jê dipirsin. Yekî Stilîlî ji Mûsa Anter pirsa çûna heyvê dike, dibêje:

–Mûsa Beg, dibên xelk diherin heyvê. Gelo rast e?

Mûsa Anter dibêje:

–Erê wele wilo dibêjin.

–Tu jî bawer dikî ku çûne heyvê?

–Erê ez bawer dikim. Ne Amerîka yan jî Uris tenê çûye.

Amerîka dibêje Uris çûye, Uris ji dibê Amerîka çûye. Yanê herdu li hev mikur tên. Herdu ji çûne. Wekî din jî mêrikê ku çûbû heyvê ji wir peyivî, dengê wî dinyayê tevde bihîst. Rast e.

Ê Stilîlî li ser van peyvên Mûsa Anter pir xemgîn dibe, dîmine heyirî û dibêje:

–Bi navê Xwedê wê ev sebav herin heyvika me xera bikin, emê li reşê bimînin.

**KARÊ XWEDÊ**

Mûsa Anter û çend Stilîlî li radyo deng û behsan guhdarî dikin. Radyo xeberan xelas dike, qala hewayê dike. Dibêje: "Wê sibe baran bê, sibe na dusibe wê roj derkeve, wê hefteya din wisa bibe."

Yekî Stilîlî ji Mûsa Anter dipirse, dibêje:

–Radyo dibê çi Mûsa Beg?

Mûsa Anter wek ku radyo dibêje hewa wê çawa be ji wî re dibêje. Ê Stilîlî dikene:

–Madem zanin wê sibehê baran bê, wê dusibe roj derkeve, hefteya din çawa derbas be, îca karê Xwedê ma çi?

**FÊDA HINGIV Û XURÎNÎYA STILÎLÎ**

Mûsa Anter li Stilîlê dima. Li bexçê xwe mêşê hingiv xwedî dikirin. Rojekê piştî nîvro yekî Stilîlî tê ba Mûsa Anter, jê re dibêje:

–Mûsa Beg, dibên li xurînî hingiv derman e. Dilê min li hev dikeve. Tiliyek hingiv bide, ez bixwim.

Mûsa Anter jê re dibêje:

–Malnexerabo esir bûye hîn tu xurin î? Heta niha te tiştek nexwariye wê hingiv çi bike ji te? Tu derman li te nayên.

**HÜSEYİN DENİZ**

# Dizê tirî kurmanc be û xwediyê rez jî zaza be...

Nenyas û Hezan du gundên Licê ne. Nenyas bi kurmancî û Hezan ji bi kirdkî (zazakî) dipeyivin. Mirovekî nenyasî dikeve rezê nezaniyan. Ne xwediyê rez bi kurmancî dizane û ne jî mirovê nenyasî bi kirdkî.


Dema xwediyê rez dibîne zilam ketiye rezê wî, tirî diçine, bi lez diçe cem zilam û pê digire, dibêje: "Tu mûsay tu her gava kanê miyanê rezê mi" (Tu hewisiyî ku tu her gav dikevî rezê min).

Mirovê nenyasî, ji ber ku bi kirdkî nizane û peyva "Mûsa yî" jê re nas tê, di xwediyê rez difetilîne: "Birayê min wele ez ne Mûsa me. Navê min Elî ye."

Xwediyê rez, li zilam dide û jê re dibêje: "Ez vana mi, o hema xeberî dano. (Ez dibêjim tu hîn bûyî her gav dikevî rezê min, ew hîna xeber dide).

Xwediyê rez têra dilê xwe li zilamê nenyasî dide û wî berdide. Û wiha dibêje: "Ez reyna reyna nêvînî bikoy miyanî rez. (Ez carek din nebînim, tu bikevî rêz) dîsa zilam baş fêm nake ka xwediyê rez jê re çi dibêje, bi ser de kuxanê dixwe.

**CEMİL OĞUZ**




# Yirmi Üç Nisan: Malzemeya siyaseta qirêj

Di tarîxa komara tirk de roja 23'ê avrêlê (nisanê) qaşo hem îlankirina meclîsa tirk û kurdan (1920) bû û hem jî wekî roja cejna zarokan hatibû îlankirin. Ev çend sal in ku Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) dixwaze li ser navê zarokên kurdan, beşdarî vê cejnê (organîzyasyonê) bibe. Lê neqebûlkirin li aliyêkî, ji bo vê daxwazê bersiv jî nedan. Îsal NÇM tevî zarokên Gulên Mezrabotan çû meclîsê û xwest vê daxwazê bi devkî jî ji Serokê Meclîsê Nizamettin Cindoruk re bibêje. Encam: Nehiştin zarok têkevin nava meclîsê jî, yanî berrpirsiyarên dewleta tirk qerara xwe dabûn. Ji bilî mebûsên kurd, destûr nedidan zarokên kurdan jî. Zarokên kurdan jî ev tewr bistran û daxuyaniya çapemeniyê protesto kirin. Îsal zarokên gelek dewletên din jî ev cejn protesto kirin. Sebeb jî îşxala artêşa tirk a li başûrê Kurdistanê bû

Gelo berpirsiyarên komara tirk ev cejn çawa pîroz kirin? Şîroveyên Çiller yên ji bo pîrozkirina vê cejnê bi îbretan dagirtî bû. Li pêş televizyonan zarok hînî şer dikirin û ji wan sozên şer distandin. Li hemberî kê şer? Li hemberî "cudaxwezên kurd", yanî li hemberî gund, çiya, jin, mêr, şervan û ZAROKÊN kurdan...

Îbretên siyaseta dewleta tirk, êdî kurdên ku li derveyî Tirkiyeyê dijîn jî tehdît dike. Artêşa tirk, li gundên Zaxo, başûrê Kurdistanê ji 23 Nisan bi zarokên kurdan da pîrozkirin. ew kesên ku heta do şivan û zarokên kurd jî di nav de, bi dehan gundiyên Başûr kuştin, malên wan şewitandin niha jî wekî gurên ku xwe kirine nava postê mîhan destên xwe yên qirêjî direjî zarokên kurdên Başûr dikin. Ew jî têrî wan nake, tiştên wekî: Atatürk; ne mutlu türküm diyene (xwazî bi kesê ku ji xwe re dibêje ez tirk im) û strana Üsküdüra Giderken aldıda bir yağmur (Gava em diçûn Üsküdarê, baranê lê kir) hînî zarokan dikin. Ew vî heqî di xwe de dibînin, lê dîtina wan a demokasiye rê nade xweîfadekirin û temsîlkirina mafên kurdan. Cejna wan li wan pîroz be. Piştî 75 salan, ew rewşa wan (nîjadperestî) nehat guhertin. Em çi bibêjin, 'Yirmi üç Nisan, ew nebûn İnsan'.

**SUUT KILIÇ**




# Cerdevan jî temaşe dikin

Li gorî muxabîrên me li Mêrdînê û navçeyên wê firotina antênên peykan zêde bûye. Wekî mînak li Midyadê zêdeyî 400-500 antênên peykan hatine firotin û nîviyê wan ji aliyê cerdevanan hatine kirin. Li gorî muxabîrê me, cerdevanekî li TV-MED temaşe kiriye û ketiye bin tesîra wê, cerdevan, vê tesîrê wiha tîne ziman: "Saeteke temaşekirina kurmancî (TV-MED) berberî 12 milyonan e." 12 milyon, heqê antênê ye, ji bo vê yekê ew, berawirdiyê bi 12 milyonan re dike.

**Welatê Me/Midyad**

DIK

## Avê ku da serî çi bostek, çi çar tilî

Komîsyona Mafên Mirovan ya Ewrûpayê, roja 12'ê avrêlê li Enqereyê li Qesra Dadê di celseyeke veşartî de komara tirk darizand. Komîsyonê di pirsiyariyê de ji rayedar û parêzkarên dewletê, pirsa şewitandina gundên Kelekçî, kuştina Mehmet Aksoy (Li Amedê di qereqolekê de bi îşkenceyê hatiye kuştin) û li Cizîrê bi bombeyê kuştina 6 kesên ji malbata Şakirgil, kir. Dewletê di celseyê de, Wezîriya Karê Derve, Fermandariya Giştî Lijneya Dadger û Dozgeran a Bilind parast.


Vê yekê di çapemeniyê tirk de gelek cih girt û li ser gelek şîrove hate kirin. Çapemeniyê pirsiyarî wekî eybeke mezin a dewletê nîşan da. Û dîsa li gorî agahiyên çapemeniya tirk, parêzkarên dewletê gotine: "Ev tiştên ku hûn dipirsin, tev PKK kirine. Tiliya dewletê di wan de tune ye." Tiştê balkêş di çapemeniya tirk de tu rojname û nivîskar napirsin: Gelo 3000 gund kê şewitandine? Failê 2 hezar cinayetên meçhûl kî vedişêre? Bajar, navçe û daristanan kî dişewitîne? Îro rayedarên dewletê berpirsiyariya van tiştan qebûl dikin.

Heta îro rayedarên dewletê PKK'ê bi gelek tiştî sûcdar kirin. Gotin: "Gerîlayên ARGK'ê, cilên leşkeran li xwe dikin û gundiyan dikujin, bi helîkopterên ermen û afganan tên gundan bombe dikin û dişewitînin, û hwd." Lê, hê nû gerîlayan bi polîsiyê sûcdar dikin. Gelo, di qereqolê de gerîla çûne li Memet Aksoy îşkence kirine û kuştine? Gotineke pêşiya heye, "Avê ku da serî, çi bostek, çi çar tilî."

**ÎSMET ÛSIF**

# 1 GULAN

## Di 1'ê gulana 1886'an de karkeran dengê xwe wiha bilind kirin: "Em we û saziyên we nas nakin."




1'ê gulanê di dîroka karker û kedkarên dinyayê de xwediyê cihekî giring e. Di vê rojê gelekcaran xwîna xebatkarên cîhanê hatiye rijandin.

Sala 1832'yan li bajarê Fransayê Lyon'ê karkerên hevrîşimê dest bi grevê kirin, wan digot: "An jiyaneke bixebat an jî bi pevçûnê mirin." Piştî wê grevê rayedarên burjuwa wisa difikirîn ku ev şer qedîya. Salên ku derbas bûn nîşan dan ku, ew hesabên wan ne rast in. Hêj di sala 1844'an de îcar karkerên lêkirina avahiyan ( înşaatan) dest bi grevê kirin.

Vê têkoşînê li Amêrîkayê pêl da û pir xurt bû. Dem ji aliyê grev û livbaziyan ve zedetir dewlemend bû. Ji van bûyeran hinek zehf mezin bûn ku di navbera wan de ya herî mezin û navdar greva jinên xebatkar a sala 1857'an bû. Di vê bûyerê de 40.000 karkerî pişt da hevalbendên xwe yên jin. Mebesta livbaziyê bidestxistina mafê xebata 8 saetan bû. Di dawiya van salan de gelek bûyer çêbûn ku deng dan, yek ji wan jî greva karkerên riya hesinî bû. Ger burjuwayên Amerîkayê bixwestana karibûn vê meseleyê bihêsani hel bikin, lê wan nedixwest.Di ser de jî polîsan karker gulebaran kirin û 12 karker hatin kuştin, dûre mêjokdaran li hemberî wan livbaziyan bi navê PINKERTON saziyeke taybet ava kir. Ev bi serê xwe û çekdar bû, bi tenê li ser grev û meşên karker û kedkaran disekinî. Bi destê vê teşkîlatê gelek karker hatin kuştin.

Sala 1886'an, roja 1 gulanê karkerên şîrketên Groupa Mc CORMÎCK HARVESTER li dijî patronan livbaziyek çêkirin. Di vê demê de endamên Pinkertonê û polîsan bêrik li ser van reşandin û 6 karker hatin kuştin. Roja 3'yê gulanê karker dîsa civiyan û meşiyan, dîsa pevçûn çêbû, piştî vê gelek kes hatin kuştin an ji birîndar ketin. Şer heya nivê şevê domiya. Nivê şevê hemû taxên karkeran ketin bin ablûqeyê û gelek karker girtin. Piştî mahkemeyan, rêberên karkerên Chicago'yê Albert PERSONS, August SPIES, George ENGEL û Adolph FICHER bi darvekirin. Hevoka wan paşîn ev bû: "Em we û saziyên we nas nakin."

**ESNAS MAYA**

# ARGK'ê rojnamevan berdan

Roja 26'ê avrêlê, gerîlayên ARGK'ê muxabîrê Reutersê Fatih Sarıbaş û muxabîrê AFP'ê Kadri Gürsel li herêma Botanê berdan. Di 31'ê adarê de gerîlayan di kontrola riya Nisêbîn û Cizîrê de ev herdu rojnamevan bi xwe re biribûn.

Buroya Çapemeniya ARGK'ê roja 24'ê avrêlê bi telefonê agahî dan ajansa KURD-A'yê û li gorî vê agahiyê muxabîrê Reuter û AFP'yê hatine berdan. Buroya çapemeniya ARGK'ê dan zanînin: "Heta vêga ku nehatibine berdan berpirsiyar dewleta tirk e. Me, roja 24'ê avrêlê li nêzîkî Cizîrê rojnamevan berdidan, lê hêzên dewletê herêma ku wê rojnamevan lê werin berdanê û bombe kirin. Piştî vê yekê me rojnamevan ji bo parastina canê wan bernedan û ji herêmê bir dereke ewle." Tê zanîn ku ARGK'ê ji Xaça Sor û Yekîtiya Neteweyan re bangek kiribû û ji wan teslîmstandina muxabîran xwestibû.



muxabîrê Reutersê Fatih Sarıbaş û muxabîrê AFP'ê Kadir Gürsel tên dîtin.

**Navenda Nûçeyan**


## KURTEJIYANA YAŞAR KAYA

Di sala 1938'an de li navçeya bajarê Qersê li Îdirê ku îro bûye bajar, hate dinyayê. Dibistana seretayî û ya navendî li Îdirê qedand. Lîse, li Stenbolê li Lîseya Kabataşê ya Mêran di sala 1957'an de qedand. Di 1958'an de dest bi xwendina dibistana bilind (unîwersîteyê) beşê Îktisadê kir. Ji ber girtin û mehkemeyan ev dibistan di sala 1965'an de qedand.

Cara ewil, di sala 1959'an de, di Doza 49'an ya bi nav û deng de hate girtin û mehkemekirin. Surgûna ewilî di sala 1968'an de ji bo 8 mehan li Konyayê dest pê kir. Di wan salan de kovara DENG ku ji aliyên welatparêzên kurd ve dihat derxistin de Yaşar Kaya berpirsiyarên nivîsaran bû. Yaşar Kaya di sala 1969'an de bi xanim Yurdagülê re zewicî û ji vê zewacê du zarok (Bêrîvan û Dara) çêbûn.

Vê gavê li mehkemeyên Tirkiyeyê, di dozên ku der heqê Kaya de hatine vekirin de nêzî 400 sal cezayê hepsê û bi milyaran jî cezayê pereyan tê daxwazkirin.

**Gelê kurd, bi sedsalan ji aliyê kesên din ve û bi awayekî pir xerab mecbûrî îdarekirinê bûye. Lê êdî gelê me dixwaze qedera xwe bi destê xwe biguherîne û li welatê xwe bi awayekî azad, bibe xwediyê soz û qeraran. Parlementoya me, bi nêrîn û niyeteke vekirî hembêza xwe ji hemû hêzên welatê me yê şoreşger, demokrat û ji gelên ku li Kurdistanê dijîn re, vekir. Me dil hebû ku ew dostên me jî di nav xwe de bûna. Lê bila bê zanîn ku me derî li wan negirtiye. ji bo wan me kontenjan veqetandiye.**



SEROKÊ PARLEMENTOYA KURDISTANÊ YA LI DE

# PARLEMENTO ÎF GELÊ KURDISTANÊ T

Piştî axaftina xwe ya li hemberî endaman, niha hûn çi hîs dikin?

– Ez difikirim û hîs dikim ku karek û barekî pir muhîm li ser milê min e. Helbet bidestketina firsetên wiha kêfa însên tê ku mirov karibe ji bo gelê xwe bixebite. Birastî jî ez pir bextiyar im. Ji ber ku parlemento, di jiyana kurdan ya polîtîk de wekî pêngaveke nû, pir muhîm û dîrokî derket holê. Ne mumkûn e ku mirov karibe li hemberî tiştekî wiha bêhîs û heyecan bimîne.

**Hûn ji zû ve di nav siyaseta kurdan de ne, hûn vê serkeftina ku demeke dirêj dewam kiriye, çawa şîrove dikin?**

– Min di xebata xwe ya siyasî ku bi dehsalan dewam dike de ev îspat kir: Mirov gava bêpartî an rêxistin bin jî, dikarin li ser piyên xwe bimînin. A duduyan, siyaseta kurdî bi xwe re qedexe û mirinê tîne, lazim e ku mirov vanv tiştan bide ber çav. Ji xeynî van, ez di jiyana xwe ya siyasî û di têkiliyên bi însanên din re jî hergav durist bûm. Helbet, wekî her mirovekî kêmasî û zeafên min jî dibe ku hebin.

Kes ne pêxember e. Lê min tu carî dev ji duristbûnê berneda. Min nikarîbû gelê xwe jî îhmal bikira. Hergav ez di nava gel de bûm, min xîret dikir ku ez pê re bimeşim.

**Ev çend roj in ku ez danişîna parlementoyê taqîb dikim, we gelek qanûnên tarîxî derxistin. Baş e hûnê çawa van qanûnan derbasî jiyanê bikin? Bingeha meşandina van tiştan heye?**

– Bingeheke zexm a siyaseta kurdan heye. Gelê kurd, li her derê doza xwe ya rast taqîb kiriye û dev jê bernedaye. Îro dinya, bi xêra gelê me yê ku li derve dijî, dinya gelê kurd û Kurdistanê baş nas dike. Bi sempatiyê li doza wî dinihêre.

Ji wê bêhtir, li her derê dinyayê qala PKK'ê tê kirin. Haya dinyayê ji PKK'ê heye, lewra ew dizanin ku rêxistineke siyasî wekî PKK'ê ji Basrayê heta Swêdê, ji Japonyayê heta Kanadayê xwedî tevgiredanekê ye. Mesela ji Cezayirê heta Erîtreyê ji Rêxistina Rizgariya Filistînê (RRF) heta IRA'yê gelek mînak li ber çavan in. Gerçî hîn me xwe bi layiqî nedaye nas kirin û xwe bi dinyayê nedaye qebûlkirin. Lê, bingeheke zexim heye, faaliyetên parlementoya me yên dîplomatîk wê li ser vê bingehê bên avakirin.

Qerarên siyasî, îdarî, aborî û leşkerî jî wê bi xêra vê bingehê, karibin di jiyanê de bêne meşandin. Bila endîşeya kesî tune be, em çi qerarê bistînin, wê bê meşandin jî.

**Dewleta tirk û derdorên nêzî wê dibêjin ku PKD "Parlemento ya PKK"ê ye. Ji aliyê din ve hejmarek hindik be jî, di nava kurdan de hin kes dibêjin ku ev parlemento gelê kurd temsîl nake, lê belê PKK'ê temsîl dike. Hûn çi dibêjin?**

– Niha binêrin, PKK ji ne ji hîvê hatiye. PKK, ji nav gelê kurd derketiye. Hebûna PKK'ê di parlementoya me de ne qelsî ye, lê nebûna wê, dê bibûya zaaf. Feqet parlementoya me ne rêxistineke PKK'ê ye. Li her derê dinyayê parlemento çawa li ser partiyan bilind dibin, li ba me jî wisa ye. Kî dikare îdia bike ku PKK piraniyeke gel temsîl nake? Tu tesîra PKK'ê li ser parlementoyê jî nîn e. Wan li ser daxwaza me ya beşdarbûnê, bi têkiliya ERNK'ê dozde endam şandin parlementoyê. Em spas dikin ji van hevalên ku giş bi hilbijartinê hatine nava me.

Parlementoya me, bi nêrîn û niyeteke vekirî hembêza xwe ji hemû hêzên welatê me yê şoreşger, demokrat û ji gelên ku li Kurdistanê dijîn re vekir. Ez jî di komisyona ku bi rêxistinên kurdan yên siyasî re hevdîtin çêkirin de bûm. Em bi perspektîfeke fireh nêzîkî herkesî bûn. Me bangî wan kir. Em gihîştin wê pirdengiya ku di nav îmkanan de ye. Rastiyeke me ya şer heye. Em nikarin çavê xwe ji vê re bigirin. Gelê me şer dike. Dewleta tirk, ji bo faaliyetên propagandaya 1995'an 24 trilyon pere veqetandiye. Ew bi van pereyan dixwazin li dijî me propagandayekê bikin. Lê ew nikarin tu encamê bistînin. Zîra em xwedî heq in. Divêt hin hêzên dost, alîkariyê nedin vê siyasetê.

**Gelo neketina hereketên kurdan yên din, ji bo hêza parlementoyê ya temsîlê nabe sebebên zaafiyetan?**

– Na. Nabe sebebê zaafiyetan. Di parlementoya me de her fikr û bawerî bi awayekî azad, cihê xweîfadekirinê dikare bibîne.

Kursiyeke me ya demokratîk heye. Hûn dibînin, herkes fikra xwe bi rehetî dibêje. Me dil hebû ku ew dostên xwe jî, di nav xwe de bibînin. Lê bila bê zanîn ku me derî ☞



# ...EYÎ WELÊT YAŞAR KAYA:

# ...DEYA ...MSÎL DIKE

li wan negirtiye, ji bo wan me kontenjan veqetandiye.

Binihêrin, hin warên rizgariya neteweyî hene. Yek ji wan şer, a din jî avakirina saziyên neteweyî û medyaya neteweyî ye. Me ji van dostan re got ku werin em li hemberî dijmin şer bikin. Dibêjin: "Na." Em dibêjin: "Werin em saziyên xwe û parlementoya xwe damezirînin", dîsa dibêjin: "Na." Em dibêjin baş e, em bi hev re rojnameyan derxînin, televizyonan ava bikin, ew dîsa bersiva hercarî didin. Êêê hewqas jî nabe. Tew çavên hinekan li qedandina PKK'ê ye û ew li benda pêmahiya (mîrasa) ku wê li dû vê hereketê bimîne, sekinîne. Ev niyet nayê fêmkirin. Hem nayê fêmkirin û hem jî nayê qebûlkirin. Bila bê zanîn ku ev xeyaleke vala ye. Em wekî kesên ku ji dil bi demokrasiyê bawer, dixwazin di nava saziyên xwe de jî demokrasiyê bidin meşandin. Em bi vê zanebûnê hereket dikin. Hedefa me pirdengî ye û ez dixwazim bidim zanîn ku parlementoya me xwediyê vê taybetiyê ye.

**Wê dinya, bi çi çavî li parlemetoya we binêre? Gelo wê kes we nas bike?**

– Parlementoya me li ser navê gelê kurd, xwediyê soz û qerarane. Jê bêhtir, ew di têkoşîna azadiyê de jî teref û rayedar e. Îradeya gelê kurd temsîl dike. Belkî hinekî wext bistîne, lê wê dinya me qebûl bike. Em ji hevdîtinên xwe vê encamê derdixînin. Em diçin her terefê dinyayê. Bi rayedarên muhîm yên her welatî re em hevdîtinan dikin. Ew pir qîmetê didin teşebusên sivîl û demokratîk. Pêşiya me vekiriye.

**Gelo hûn di nêzîk de texmîn dikin ku di nêrîna Komara Tirkiyeyê (KT) ya li hemberî parlementoya we de guherîn çê bibin?**

– Ez KT'ê ji nêzîk ve teqîb dikim. Di vî 70 salî de dewra herî kritîk, ji bo wan îro ye. Li Tirkiyeyê kêmasiya mirovên ku ji kargeriya dewletê baş fêm dikin, heye. Ev sih sal e ku Demirel bûye wekî qedera Tirkiyeyê û pêşketina wê wekî bendekî girtiye. Hîn jî ew Tirkiyeyê li paş dihêle. Dewleta tirk, hê jî israr dike ku wê ev mesele bi riyên leşkerî bê helkirin. Ew ji demokrasiyê bawer nake. Demokratîkbûna Tirkiyeyê, xeyaleke vala ye û ji xwexapandinê pê ve ne tiştekî din e. Ji bo ku li Tirkiyeyê demokrasî çêbibe, lazim e ku pirsgirêka kurdan bê çareserkirin. Di rayedariya dewletê de îradeyeke wiha nayê dîtin. Feqet, ew kesên ku di çareserkirina leşkerî de israr dikin, di nava wan de jî jihevketinek heye. Ev jihevketin, dibe ku bi derbeyên şerê başûrê Kurdistanê hîn bêhtir bibe. Heger ku di dewreke wiha de li me bigerin û bixwazin bişêwirin, em pir ecêbmayî namînin.

**Ez dizanim hûn (PKD) hedef dike ku xwe biguherîne, bike Parlementoya Neteweyî û vê saziyê bibe welêt, li wir bicih bike. Gelo hûn vê yekê mumkûn dibînin?**

– Li welêt meclîsên me yên Eyaletan hene. Dîsa li Başûr Meclîsa Federal a birayên me heye. Hin saziyên me yên din jî hene. Di bin pêşkêşiya PKD'ê de ev saziyana dikarin bên ba hev û Kongreya Neteweyî çêbikin. Kongreya Neteweyî jî dikare Meclîsa Neteweyî ava bike. Ev mijar, di bernameya me de heye. Ez bawer dikim ku wê çêbibe. Bingeha wê heye. Di nava kurdan de pêvajoya yekîtiyê bi awayekî erênî, bi pêş dikeve. Helbet a muhîm, bûna li welêt e. Wê roj bê ku emê karibin wê li Diyarbekirê vekin. Ev mafê me yê herî normal û xwezayî ye. Êdî kurd şiyar bûne. Hema dikare bê gotin ku parlementoya gelên ku hejmara wan nagihîje sed hezarî, heye. Wê her tiştê me jî çêbibe.

**Li Rojhilata Navîn, welatê me Kurdistan jî li vê herêmê ye, avakirin û parastina demokrasiyê hîç ne hêsan e. Em rastî êrîşên ku ji derve li hemberî demokrasiyê û saziyên wê tên jî, dibin.Tewra we li hemberî mudaxeleyeke derve ku li dijî parlementoya we çêbibe, wê çawa be?**

– Ezê li hember derkevim û gava pêwist be ezê di ber de bimirim. Ezê bi awayekî cidî mirinê tercîh bikim. Lê ez dixwazim tiştekî jî bidim diyarkirin ku em van tiştan najîn. Herkes dizane ku gelê kurd gelek derdê rejîmên leşkerî dîtiye. Qîmeta demokrasiyê baş dizane. Avantajeke muhîm jî, felsefeya şoreşa Kurdistanê ye. Felsefeya me, xwediyê taybetiyên humanîter û demokratîk e; ev jî temînata me ye. Nihêrîna me ya li demokrasiyê, ne ji jor dana mafan e, lê belê ji jêr û ber bi jor ve avakirina demokrasiyê ye. Binihêrin li Tirkiyeyê; derbasbûna wan a pirpartîbûnê, ji ber ketina nava NATO'yê ye. Bi demokrasiyeke şeklî, di ser re û ne ji dil, bi salan hem xwe û hem jî dinya xapandin. Merheleya ku hatiyê li ber çavan e. Ji hêla din ve di vê dinyaya ku biçûk bûye de, bixwazinnexwazin, hûn nikarin ji demokrasiyê birevin. Çavê herkesî li ser we ye. Tiştê herî muhîm ew e ku gelê me xwediyê bingeheke demokratîk e. Ez ji vê re dibêjim felsefeya şoreşa me ya demokratîk.

**Hûn dikarin qala çûna xwe ya Amerîkayê bikin. Wekî hergavê hûn vê carê jî bûn hedefa çapemeniya tirk. Armanc û encama gera li Amerîkayê çi bû?**

– Gera me pir baş û serkeftî bû. Di civîna ku Yekîtiya Edîtor û Nivîskarên Amerîkayê organîze kiribû de ez jî yek ji pevdaran bûm. Civîna ku bi beşdariya 600 rojnamevanî hatibû lidarxistin, sê rojan dewam kir. Roja ewilî Serokkomarê Meksîkî, roja dudan Serokwezira Kanadayê, roja sisiyan jî serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) birêz Bill Clinton û ez axivîn. Peyva min 35 deqîqeyan dom kir. Min 45 deqîqeyan jî pirsên rojnamevanan bersivand. Çapemeniya tirk li wir tunebû û gelek tiştên derew û çênebûyî nivîsandin. Li gorî çapemeniya tirk, gava ez peyivî me, Clinton ne li salonê bûye. Halbukî ew li wir bû û bi baldarî li min guhdarî dikir. Li hêla din me hevdîtinek jî çêkir. Me wekî prensîb, tu agahiyan nedan rojnamevanên tirk. Ji ber ku demeke berê heyeteke me, wê bi serokê Neteweyên Yekbûyî (NY) Butros Galî re hevdîtinek bikirana. Lê rojnamevanên tirk bi bihîstina vê nûçeyê, tavilê ew gihandin balyozxaneya tirk, bi mudaxeleya rayedarên dewleta tirk, ev hevdîtin çenebû.

Lê ez dikarim vê bibêjim ku me gelek têkiliyên muhîm çêkirin û di nêzîk de ezê li ser van têkiliyan dûr û dirêj binivîsim.

**Bi sifetê serokê Parlementoyê, mesajeke we ji gel re heye?**

– Heye. Gelê me bi sedsalan ji xelkê re leşkerî kir, bac da û ji aliyê wan kesan ve bi awayekî pir xerab hat îdarekirin. Ji bo wan xelkan jî siyaset kir. Xizmeta gelê me ji bo xwe hê nû ye. Ev bûyereke pazde–bîst salî ye. Gelê me bi şer, bi ser xwe ve hatiye. Îroj zarokên xwe dişîne leşkeriyê (gerîlatiyê) û lojiştika wan dikin. Gelê me ji bilî van wezîfeyan, karê dîplomasiyê jî dike. Fedekariyeke pir mezin dike. Ez qasî bi xwe bawer im, bi gel jî bawer im ku wê gel li parlementoyê xwedî derkeve. Parlementoya me xwedî bingeheke dînamîk e. Ji bo gelê kurd jî şensek e û wê di dahatûya wî de rolek gelekî mezin bilîze.

GÜNAY ASLAN



Dîmenek ji Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welêt

**Parlementoya me li ser navê gelê kurd, xwediyê soz û qerara ye. Jê bêhtir, ew di têkoşîna azadiyê de jî teref û rayedar e. Îradeya gelê kurd temsîl dike. Belkî hinekî wext bistîne, lê wê dinya me qebûl bike.**

www.arsivakurd.org



## Şemo li Dersimê da

Gerîlayên ARGK'ê roja 25'ê avrêlê bi BKC û roketan êrîşî mewziyên li dora bajarê Dersimê kirin. Êrîşa gerîlayan ji seat 23.00'yan heta derengiya şevê dewam kir.

Hêzên dewletê nêzîkî mehekê ye ku li Dersimê bi hêzêke li dora 30–40 hezar leşkerî operasyonê dikin. Di çapemeniya tirk de jî roj tune ku der heqê wê operasyonê de nûçe dernekevin. Dîsa li gorî agahiyên çapemeniya tirk hêzên dewletê li Dersimê dor li gerîlayan girtine û zayîatên mezin dane wan. Bi awayê ku çavkaniyên herêmî û çavkaniyên gerîla didin zanîn, operasyona artêşa tirk, li Dersimê bi balefir û topan bombekirina çiya û gundan e. Tê zanîn ku gerîlayên ARGK'ê beriya hefteyekî avêtibûn ser Alaya Xozatê.

Roja 25'ê avrêlê hêzên ARGK'ê bi roket û BKC'yan êrîşî mewziyên tîmên taybet û leşkeran ên li dora navenda Dersimê kirin. Gerîlayan qasî 3–4 seatan cerda xwe domandin û piştre vekişîn. Der heqê mirî û birîndaran de tu agahî bi dest neketin.

**Gerîlayan li Şirnexê dan**

Gerîlayên ARGK'ê roja 21'ê avrêlê avêtin ser navenda Şirnexê, taxa cerdevanan û lojmanên polîsan bi çekên BKC û B–7'an gulebaran kirin. Di navbera gerîla û hêzên dewletê de şer derket. Hate gotin ku gelek malên cerdevanên û polîsan xesar dîtine. Gerîla bêzayîat vekişîn, der heqê zayîatên hêzên dewletê de agahî bi dest neketin.

**Navenda Nûçeyan**

### Bi vekişîna artêşa tirk re şer li bakurê Kurdistanê gur dike

# Şer ji Başûr ber bi Bakur tê

**Bi vekişîna artêşa tirk şer li bakurê Kurdistanê gur dibe. Hêzên ARGK'ê li gelek deveran êrîşî hêzên dewletê yên ku vedikişin dikin. Her çiqas vekişîna hêzên tirk piranî bi erebeyên bizirh û bi firokeyan çêdibe jî, ew nikarin xwe ji kemîn û êrîşên gerîla xelas bikin û zayîatên mezin dibînin.**

**20.4.1995**

Hêzên dewletê li Geverê ketin kemîna gerîlayên ARGK'ê. Piştî kemînê di navbera leşker û gerîlayan de şer derket. Di kemîn û şer de der heqê zayîatên herdu aliyan de agahî bi dest neketin.

Di geliyê Uxartê ku li mintiqeya Helkiz a Sasonê ye di navbera hêzên dewletê û gerîlayan de li gelek deveran şer derket. Gerîlayan di van şeran de cerdevanên gundê Kuramlı û Xerdelê xistin kemîna xwe. Di kemînê de 5 cerdevanên gundê Kuramê û 2 cerdevanên Xerdelê mirin. Gerîlayan li eynî mentiqeyê bi hêzên dewletê re jî şer kirin. Di vî şerî de 9 leşker û 4 gerîla mirin, 15 leşker jî birîndar bûn.

**21.4.1995**

Gerîlayên ARGK'ê bi ser navenda bajarê Şirnexê ve girtin. Gerîla ji 4 milan ve ketin bajêr û êrîşî taxa cerdevanan û lojmanên polîsan kirin. Di êrîşê de gerîlayan tax û lojman bi B–7 û BKC'yan gulebaran kirin. Gerîlayên ARGK'ê piştî cerda xwe bêzayîat vekişiyan. Der heqê zayîatên hêzên dewletê de agahî bi dest neketin.


Li gorî agahiyên çavkaniyên herêma Şirnexê, hêzên dewletê li dora çiyayê Mişare û Gabarê jî bo operasyonê dicivin.

Gerîlayên ARGK'ê li navçeya Edeneyê li Osmaniyeyê 2 kes kuştin. Li gorî agahiyan, gerîlayan ew kes ji bo ku alîkarî bi dewletê re kirine û îxbara welatparêz û gerîlayan kirine, hatine kuştin.

**22.4.1995**

Hêzên dewletê piştî bombekirina girên Erî ku li hêla Botan e, derketin araziyê. Piştî bombekirinê, gerîlayan êrîşî leşkeran kirin. Di cerda gerîlayan de 2 leşker mirin, gelek jî birîndar bûn.

Li nêzîkî Gêxiya Çewlikê, gerîlayan êrîşî mewziyên leşkeran kirin. Di êrîşa gerîlayan de leşkerek mir, yek jî birîndar bû.



Gerîlayan bi çekên giran êrîşî qereqola Dereovaya Nazimiyeyê kirin. Di cerda gerîlayan de 3 leşker mirin, gerîlayan dest danîn ser malzemeyên cur bi cur.

Gerîlayên ARGK'ê li herêma Haftanînê li warê Sinekê ji du milan ve êrîşî leşkeran kirin. Di êrîşa gerîlayan de gelek leşker mirin.

Li Haftanînê gerîlayan êrîşî Girê Xandur kirin. Li gorî agahiyên gerîlayan, di vê cerdê de gelek leşker mirin û birîndar bûn. Şer heta demeke dirêj dewam kir.

**23.4.1995**

Hêzên dewletê ji Başûr bi aliyê sînor ve vedikişin. Gerîlayên ARGK'ê li sînorê Çêlê êrîşî leşkeran kirin. Di êrîşa gerîlayan de cerdevanekî bi navê Mustafa Öztürk mir.

Li warê Bircela û Avaşînê di navbera gerîla û leşkeran de şerên dijwar dertên. Di van şeran de heta vêga 4 leşker û cerdevanek mirine, cerdevanek birîndar bûye.

Hêzên dewletê ji Haftanînê bi aliyê çiyayê Xortuma re ji ber êrîşên gerîlayan vedikişin. Gerîlayên ARGK'ê hêzekî leşkerî li çiyayê Xortuma xistin xefika xwe. Di xefika gerîlayan de 19 leşker mirin.

Artêşa tirk ji Haftanînê vedikişe. Konvoyeke 130 erebe bi 30 tangî di riya Zaxoyê de vekişiyan Silopiyê.

**24.4.1995**

Gerîlayên ARGK'ê li ser xeta Şiwreza–Ertuş û Endikê êrîşî artêşa tirk kirin. Piştî cerdên gerîlayan li 5 deveran leşker xistin kemîna xwe. Di kemînan de 17 leşker mirin, gelek leşker birîndar bûn.

Li Botanê li warê Cilo di navbera hêzên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket. Şer ji sibê heta êvarî dewam kir. Di şerde 3 leşker mirin 4 gerîla birîndar bûn. Piştî şer leşkerekî pêl mayinê kir û mir.

Li mintîqeya Avaşîn a Haftaninê, ji hêzên dewletê 4 leşker û 2 cerdevanan di operasyonan de qerîsîn û mirin.

Di navbera Cizîr û Şirnexê de gerîlayan erebeyeke leşkerî xiste kemîna xwe. Di kemînê de erebeya ku roket xwar îmha bû.

Gerîlyan girtin ser qereqola Sivgedika Gêxî. Di cerda gerîlayan de qereqolê xesareke mezin dît û 8 leşker mirin. Gerîla piştî êrîşê bêzayîat vekişiyan.

Hêzên dewletê li dora Dihê dest bi operasyonêkê kirin. Di operasyonê de leşker ketin xefika mayinan. 3 leşker birîndar bûn.

**25.4.1995**

Li warê Avaşîn a Behdînanê, gerîlayên ARGK'ê hêzên dewletê xistin kemîna xwe. Piştî vê kemînê di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket. Şer 3 seatan re domkir. 3 leşker û 3 cerdevan mirin.

Gerîlayên ARGK'ê li Erdîşê di navbera warê Kele û Çetnosê de nêzîkî 100 leşkerî xistin kemîna xwe. Di vê kemînê de der hêqe mirî û birîndaran de tu xeber bi dest neketin. Şer hê jî didome.

Li çiyayê Çiloyê, li warê Piyanîşê gerîlayên ARGK'ê hêzên dewletê xistin kemîna xwe. Di vê kemînê de 16 leşker mirin, 6 jî birîndar bûn.

Li Başûr li newala Basyayê di navbera gerîlayan û hêzên dewletê de şer derket. Di Geliyê Basyayê de 8 cerdevan û serleşker jî di nav de 150 leşker mirin.

Hêzên dewletê di navbera Çemşu û Zapê de pêl mayinên gerîla kirin û 5 leşker mirin.

Li ser girê Sîpanê, gerîlayên ARGK'ê êrîş dan ser leşkeran û di vê êrîşê de 11 leşker mirin.

Di navbera warên Besta û Bilijnê de ku li herêma Botan e, di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket. Di vî şerî de hêzên dewletê ji warên Besta û Bilijnê revîn, gerîla laşên 5 leşkeran dîtin.

Gerîlayên ARGK'ê li Botanê êrîş dan ser qereqola Haftarîçê. Di vê êrîşê de 3 leşker mirin. Gerîlayan 2 kobra jî bombe kirin.

**Kurd–A/Welatê Me**

www.arsivakurdi.org

# Be bîr hawirdinî hozanwanî mezin Hesen Zîrek

(Soranî)

Bulbulî deng xoşî kurd Hesen Zîrek le Salî 1925 le Şarî Bokanî rojhelatî Kurdistan le binemaleyekî Hejar çawî bem gerdûne helhênawe. Tawî mindalî û lawêtî xoy her le şarî Bokan birdote ser. Le temenî 27 salî da şarî Bokanî becêhêştiwe û helweday şaranî tirî Iran buwe, paşan le başûrî Kurdistan xoy girtotewe. Diway meweyek ke deng û sazî be nawbang buwe dawayan lê kird ke biçête îstigey Baxdad bo tomar kirdinî awazekanî. Zîrek wek endamî îstigey kurdî damezra û ziyatir le 150 aheng û goranî lewê tomar kird, paş maweyek dilî bo zêdî kurkandî û sereray têkoşanî zor bo manewey li şarî Baxdad gerayewe berew rojhelatî welat, her çende gelî başûr gelê xembar bûn be geranewey bo rowhelat belam yadgarêki mezinî le nêw dilî hemû kesêk da be cêhêşt, bigre heta êstaş kem mal heye ke kasêtê Hesen Zîrekyan nebêt.



Paş geranawey bo rojhelatî welat têkoşanî ew le karî hunerî da ranewesta, bigre ziyatir kewte hewle û tekoşan lew buware da, be şar û gundekanî welat da kewte geşt û guzar û aheng gêran, leweş ziyetir xoy geyande îsigey Taran beşî kurdî û îstigekanî Kirmaşan û Sine û Tewrêz. Dengî wekû bulbul be ser hemû dar û çilêkî Kurdistan da deyzirîkande be demî hemû mindal û gewre û ciwanêk da goraniyekanî deitranewe.

Zîrek tiwanî le meweyekî kurt da nawbangêkî zor mezin derbikat û tiwanî bew hunere sermayeyekî zor nayab bo gelekey be cê bihêlê. Lew geşt û guzarey da be şarekanî Taran, Kirmaşan û Tewrêz ziyatir le 260 goranî heme corey folklorî û neteweyî bênête tomar kirdin, le here benawbang tirîn goraniyekanî ke wekî sirûdekî neteweyî ke heta êsta dexrête ser tomarga, sirûdî Newroz e.

Zîrek nek tenha le goranî witin da nawbangî derkirdibê, belkû bayexî zorîşî dawe be awaz danan bo hemû goranilekanî, wate gelêk anêrî muzik şareza buwe, le heman katîş ta le zorbey goranilyetarî, xoy awazî bo danawe. Hoy geş û guzarekeşî be şarekanî Kurdistan da geran be şiwên folkilor û kelepûrû kurdû buwe ke bitwanê le awazekanî be kar bihênêt, belê Zîrek ta kotayî temenî liwanî ziyad le 1000 goranî bênête tomar kirdin le îstige kurdiyekan da bêcge lewey ke çendeha kasêtî goranî be mosîqa û bê moseqa hênawete tomar kirdin le malî dost û hawrêkanî.

Ta ew rojey diwa henasey mergî le şare dilgîrekey xoy da, şarî Bokan le 24.06.1972 da malawayî le gel û welatekey kird, paş ewey ke mîratiyekî zor gewre û qutabxaneyekî hunerî mezin bo goranî û awazî kurdî becêhêşt.

**DILÊR**

# DEFTER

## Kurdistan: Diruşmî wiryakirdinewe û fêrbûn e

(Soranî)

Newed û hewit sal lemewber, le tarawge da, bawe gewrey rojnamenûsî kurdîman towî yekemîn pîtî kurdî le kêlgey rojnamenûsî da çand. Gor beheşt bew karey wenewşeyekî geşî le berokî dîrok û bûnman da, wenewşeyekî percû asa bo heta hetaye le baxçey koşk û seray welatî befir û nêrgiz da geş binwênê û hemwanîş be tasewe bonî pêwenên. Ew kele piyawe, bizne rêyekî sext û dijwarî bo tey kirdîn, bizne rêyek, ke her debû em karwanî rojnamenûsiyemanî piya da birwa. Ew deywîst le lûtkewe le diyardekan birwanîn, nek le binarewe.

Ew rojeş wekû emro, dayikî niştiman be çêbûnî em korpe çawgeşey "tawanbar" dekra, ew çepke gule peyvey naw gûldanî rojnamenûsiyan be dirik denirxand. Lê sere sewdakey ew piyawe be emek û be derbeste le tarawgeş da her le ser balîfî kurdayetî heday deda, wekû tir be hîç kilocêk pey be sextî xebatî xizmet gûzaryaney em xanewadeye nedebra û qût danyan wekû qût danî gelekeyan karî le kirde be der bû.

Ew roje, le qutabxaney welatparêzî û le polî rojnamenûsî da, ew mamosta gewreye derzêkî mezinî pêdayin, derzêk le ser lapere sipiyekanî hest û hoş reng rêj kirawe. "Îtîfaq" yekêk lew derzane bû. Axxx kurdî kulol, sed sal e derzî îtîfaq dedrêyit û hêjî fêr nebwît. Derzî dostayetî, mirovperwerî û aştîxwazî, emaneş derzî tirî ew fêrgeye bûn, mamostakan bo xoyan yekem becêhênerî ew helwêste bûn, Abdûlrehman Bedirxanî sernûserî Kurdistan haşay le kurekey kird le pay beşdarîkirdinî le kuştarî Ermenyan da.

Ew fêrmanî kird rojnamey rasteqîne qîbley cemawere, le amêz dekrê û be singewe degîrêt. Ew derzey ew fêrî kirdîn, ke rojnamey dûr le diro çend be nirx û be rûmet e, û tu car nakrê be xwanî hîç kele putêk. Ew derze fêrî kirdîn, le tengasî dîrokî da, minalan bibin be "ba" û rojname berin bo gişt goşe û kenarêk, lewra rojname rûsûrekan wekû beyannamey nihênî wan.

Ew rojeş xawenî rojname rûzerdekan, berêweberanî Sitanbol, dawayan le Qahîre dekird ew "tawanbare" yan bidatewe dest, ew rojeş wekû emro wêray ewey le malî xoman da rê nadrêyin, le tarawgeş da neyaran lêman nagerên. Ew rojeş mîna emroy Welatê Me, be hevokî wekû "Edene bûye weke bajarekî kurdan "tawanbar" dekrayin. Kurdistan lew roje da namey Amed, Sulêmanî, Mardîn, Musil û Edeney pêkra le amêz dekird û bem karaney hem xoy wekû rojnamey sercem gelî kurd denirxand, hem jî ewey dehênaye ziman ke em welate yek cestey zînduwe û bes.

Em Kurdistane, le tarawgeyekî na cêgîr da, be derbederî û koçerî em hemû xeme gewreyey le hegbe nabû, belê ew le derbederî da, her rojey le kûçeyek da bargey dexist û hewarî lê heldeda, lew bare na lebare da, em şope be nirxey bo cêhêşt.

Le yadî 97 saley Kurdistanî wirya kirdinewe û fêr bûn da: Selaw le giyanî Mîqdat Medhetî ser qafleçî ziring û wirya. Selaw le rêbwar û kele piyawekanî tirî em xebate sexteman. Dirûd bo giyanî şehîdanî tevgerî rojnamenûsîman.

**Percû:** Mucîze
**Tarawge:** Menfa, Sürgün.

**SÎRWAN REHÎM**

# Banga Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK)

Bilbilê jiyanê!
Mamosteyê kurd!

Sal sala Ehmedê Xanî ye, sala zimanê kurdî ye, sala gelê kurd e. Li çiyayên Kurdistanê gul û gulşen geş dibin. Leşkerên Ahora roj dane ser destên xwe. Ahrîman di nava tariya dilê xwe de difetise. Seranserê Kurdistanê bûye ronahî. Jiyana nû li hêviya gelê kurd e. Şerê serxwebûn û azadiyê gavên dawî ber bi dewletbûnê ve davêje. Herkesê kurd, herkesê mirovperwer berpirsiyarê serkeftina vê pêşveçûnê ye.

Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK) ji bo nûkirina xebata xwe û avêtina gavekê ber bi koçbera nû ve biryara lidarxistina kongreya xwe ya awarte da.

Mamosteyê kurd!

Kongreya "YMK" ya awarte wê bi dilsozî û welatperweriya te serkeftinê bibîne.

Were! Bi hev re em bibin şayanî Ehmedê Xanî, zimanê kurdî û gelê kurd.

Were! Bi hev re em bibin şayanî Kurdistana şîrîn.

Bijî şoreşa Kurdistanê!

Bijî têkoşîna çandî ya Kurdistanî!

Bijî Yekîtiya Mamosteyên Kurd "YMK"!

**VEXWENDNAME**

Hevalê birêz!
Mamosteyê kurd!

Sala Ehmedê Xanî, sala zimanê kurdî, sala avakirina saziyên neteweyî yên kurdî û bi giştî sala gelê kurd 95 bi germiya şoreşa serxwebûn û azadiyê geş dibe.

Êdî gelê kurd gavên dawî ber bi dewletbûnê ve davêje. Hevsarê dîrokê girtiye dest xwe û dikişîne ser mirovahiya hemdem. Herkesê kurd, herkesê mirovperwer di cihê xwe de, di nava sazî û yekîtiya xwe de, di vê pêşveçûna pîroz de dibe xwedî par.

Mamosteyê kurd jî, di nava yekîtiya xwe YMK'ê de deynê dîrokê bi berpirsiyarî hildigire.

Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK) we bi germiya şoreşê silav dike û ji dil û can we vedixwîne kongreya xwe ya awarte.

**Mêjû:** 13.05.1995
**Saet:** 10.30
**Navnîşana cih:** Faulenstr. 9
Bremen

**Komela Hevaltî**
**Tel:** 0421-1692646

**Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK)**
**Komîteya kargêr**

## Li gorî endamên Koma Azad di muzîka kurdî de ji ber şertên têkoşînê;

# 'Şîn û şahiyên me ketine nava hev'

*Koma Azad komeke kevin e, di gel vê yekê hîn kasetek bi tenê derxistine. Ew jî li Ewrûpayê, li Almanyayê. Van rojan dike kaseta wan li vir jî derkeve. Beriya ku ev berhema wan a pêşîn bikeve destê muzîkhezan, li navenda rojnameyê me bi wan re hevpeyvînek çêkir.*

**Koma we, heta niha çima kaset li vir dernexistin?**

Ji 90'î bi şûn ve di piyaseya Unkapaniyê de her kesî rabû kaset çêkirin. Ên ku ziman zanibûn, nizanibûn, bi kurdî kilam gotin. Di rewşeke wiha de me nexwest em bi serê xwe kasetekê çêkin. Ji ber ku xebatên me ne şexsî ne, em ji xeletiyan tirsîn. Ji hêla hiqûqî ve jî asteng li pêşiya me hebûn.

**Hûn çi navî li xwe dikin, bi ya we pîvanên muzîka kurdî çi ne, mirov dikare çawan muzîka kurdan û ya gelên din ji hev biqetîne?**

– Em wiha bibêjin. Muzîka ku Koma Azad çêdike, tê de formên (awayên) muzîka kurdî pir in. Lê em bi xwe nikarin bibêjin ku muzîka me bi temamî kurdî ye. Ev jî ji vê rewşê tê; gelek sal in ku bi gelê me re çanda me jî di bindestan de ye, tê talankirin û eciqandin. Em di hêla ilmî de muzîka xwe zêde nas nakin.

Ji ber ku em nas nakin em dikarin vê jî bibêjin; em ne tam profesyonel û ne jî amator in.

**Di kaseta we de kesên ku amûrên muzîkê bi kar anîn û lê dan, gelo çiqas ji muzîka kurdî re nas bûn, bi dilê we lê dan?**

– Kifş bû ku muzîka me nas nedikirin, aranjor nota derdixin û didine ber wan. Ew jî lê didin. Lê ew ruhê muzîka kurdî nîn e. Gelek caran tiştê ku wan lê dixist, deng li dilê me nedikir, me digot qey tiştekî din e.

**Ji bo ku bi terheke zanistî (ilmi) û profesyonel muzîka kurdî bê çêkirin û amûr bêne bikaranîn, xebatek li NÇM'yê li dar ketiye gelo?**

– Di vê hêlê de li NÇM'yê xebat hene. Ev gav me bi xwe avêt. Di kaseta me de, me ji xwe re li sazê xist, me ji xwe re li cûrayê û neyê xist. Gîtara klasîk a akustîk hevalekî me yê ji NÇM'ê lêxist. Bingeha kasetê, me bi xwe çêkir, yanê hevalê Merdan aranjortî kir. Ew di Koma Amed de ye.

Em dikarin bibêjin ku bi giranî bingeha vê kasetê ji aliyê me ve hatiye çêkirin.

**Ez di xebatên komên NÇM'yê de piredengiyê dibînin. Hema bibêjin hemû koman dest avêtine vê yekê. Ev rewş ji ihtiyaciyekê tê an jî modeyek e, çi ye?**

– Em bi xwe di muzîkê de piredengiyê wekî ihtiyacê dibînin, lê kesên ku wekî modayê dibînin jî hene. Gere mirov ji vê bitirse. Wexta ev bibe moda, wê muzîka kurdî bikeve rewşeke wenî (wisa) ku rîtmên popê bikevinê. Îro ritmên popê ji muzîka tirkî re bûne moda û tê de zêde têne bikaranîn. Sibê roj wê ji nav me jî rabin, bibêjin: "Ev ji me re bûye ihtiyac." Divê mirov moda û îhtiyacê tevîhev neke. Îro îhtiyaca muzîka kurdî ji piredengiyê re heye. Lê divê mirov nekeve şaşiyekê. Zêde, piredengî jî ewê me ji cewherê muzîka kurdî dûr bixe.

**Dema hûn ji xwe re stranekê biniqînin an jî çêkin, hûn bi kîjan pîvanan vê hilbijartinê pêk tînin?**

– Berê pêşîn em bala xwe didin rîtmê ku li gorî folklora kurdî ye an na, em vê datînin ber xwe. A din melodî jî lazim e li gorî ruhê kurdî be. A herî muhîm, wexta stran folklorîk be, çiqas folklora zimanê kurdî tîne ziman. Peyv jî divê, di navbera xwe de mîna kompozîsyonekê bin, bi hev re girêdahî bin, ji hev neqetiyayî bin. Helbest ger evînî be, ger jî şer bîne zimên, ku çiqas wêjeyî (edebî) ye, em pir bala xwe didin van.

**Gava em dêhna xwe didine gotinên stranên ku nû hatine çêkirin, naveroka wan û gotinên wan bi piranî dişibin hev. Di vî warî de nûtiyekê ez nabînin. Hûn li ser vê yekê çi difikirin?**

Gava em bi peyvekê digirin, tim li ser wê disekinin. Gelek peyv jî folklorîk in, ji ber vê jî tê. A din edebiyata kurdî bi serbestî divê hêlê de jî nikaribûye bixebite. Hebekî teng maye. Lê dengbêj di vê yekê de fireh in. Her yekî ji wan awayekî wan heye.

Kêmasiya me tevan heye, serê pêşin em li ritman dinihêrin. Em li wan ritmên sivik û rihet geriyane ku em karibin li ser melodiyê çêbikin û bistirin. Bi piranî ritmên 2/4, 6/8, 4/4 tên bikaranîn. Ji ber ku dîlan bi bêhtirî li ber van tê girtin.

**Stranên me bi dîlan û govendên me re eleqedar in. Li ber ritmen sivik govendên sivik û li ber ritmên giran, govendên giran tên girtin ku ji wan re giranî jî tê gotin. Lê bêhtir meyl li ser awayên sivik e, gel hereketê dixwaze?**

– Belê gel hereketê jî dixwaze. Ritmên zêde sivik hebekî xîtabî hîsên mirov dikin, mirovan radikin ser lingan, mirovan dicoşînînin. Lewma meyl li ser vî awayê muzîkê heye.

**Lê, heke li ser gotinên vê muzîka sivik bê sekînin, tê dîtin ku di gotinan de mesajên girîng jî hene. Gava guhdar xwe ranegire û rabe li berê bilîze, wê çawan vê mesajê fêm bike. Ev ked bi avê re naçe?**

– Ne mumkûn e ku mesaj bê standin. Ev êdî bi wî kesê ku helbestê çêdike, dimîne. Dema ku ritmê leyistinê be û mirov rabe li serê gotinên şinê çêkî, wê çaxê rewşeke arabesk (bêaheng) derdikeve holê. Di navbera ritm û gotinan de, di navbera ritm û melodiyê de ahengek nîn be, ew êdî arabesk e.

Divê mirov miqateyî vê yekê be. Bi zanebûn karê xwe bike.

**Ji bo nimûne dibêjim. Strana "Bîngol şewtî mij dûman e," ritmên wê sivik in û gotinên wê jî şewate ne ango yên şînê ne.**

– Îro şîn û şahiyên me ketine nava hev. Ev jî çandeke nû ye. Berê kesî li ser miriyên xwe şehîdên xwe nedilîland. Ev e, îro em dinihêrin, li ser wan tilîliyê dikişînin, li ser miriyên xwe, şehîdên xwe dîlanê jî digirin.


**Gava li kasetan tê guhdarîkirin, jê tê derxistin ku baş bi kurdî nizanin û ji wan nayê sehkirin. Hûn di jiyana xwe de çiqas kurdî bi kar tînin?**

– Dema ziman rast neyê bikaranîn, melodî çiqas xweş be jî qîmeta wê nîn e. Em li Kurdistanê dijîn û di navbera xwe de bi piranî em bi kurmancî dipeyivin. Lê carinan jî em bi tirkî dipeyivin. Ev jî rastiyeke me ye.

**Koma Azad di taliyê de stranbêjî an jî muzisiyênî daye ber xwe?**

– Ji bo ku em karibin muzîka kurdî bi pêş ve bibin, bi cîhanê bidine naskirin, lazim e ku em ilmê muzîke bizanibin, alfabeya wê zanibin. Dema em nezanibin, em nikarin zimanê wê jî bi pêş bixin. Heta em nota û taybetiyên wê li ser kaxezan ranexin em nikarin wê bidin naskirin. Em heta êvarê kilam û stranan bistrînin jî bêfeyde ye.

**HEVPEYVÎN:**
**ZANA FARQÎNÎ**




| **Berê – A** | **Berê – B** |
|---|---|
| **1.** Şerê Azadî | **1.** Ala Serxwebûn |
| **2.** Şemal | **2.** Dayê |
| **3.** Kember Zêr | **3.** Newroz |
| **4.** Şox û Şeng | **4.** Serhildan |
| **5.** Rinda Min | **5.** Bes e |
| **6.** Lo Rezo | **6.** Delal |



**Koma Azad di şahiyekê de têne dîtin.**

## KOMA AZAD

Hîmê komê di navbera salên 86–87'an de tê avêtin.Heta sala 90'î bi awayekî amatorî xebatên xwe didomînin. Endamên wê didine zanîn ku wan îradeya komeke muzîkê temsîl nekirine û di dorhêleke teng de mane.

Bi sala 90'î re derketin sehneyê. Berî vê rewşê tenê di dîlan, şahî û şêniyan da deng li gel kirine. Piştî ku di sala 1991'î de Navenda Çanda Mezopotamyayê tê vekirin, kom jî, ji bo ku bi şêweyekî profesyonel karibe karên xwe yên muzîkê bidomîne, tevî xebatên vê saziya çandî dibin.

Serê pêşin kom li Mêrdînê dest diavêje warê muzîkê û li navçeyên (qezayên) wê dest bi çalakiyên xwe dike, tevî bajarê Amedê. Di serê 1990'î de êdî kom berê xwe fireh dike û Herêma Çukurovayê jî, ji xwe re dike bergeh.

Piştî ku beşdarî NÇM'ê dibe, ji Êlihê (Batman) heta bi Stenbolê, bi stran û lawikên xwe silav li gel dike. Niha li şaxa NÇM'ya Amedê çalakiyên xwe dewam dike û ji çar kesan pêk tê. Lê carinan endamên wê kêm û zêde dibin.



www.arsivakurd.org

# ÎMPARATORIYA WAŞTOXEY

**Sermiyan:** Nagisa Oshima
**Kaykerdoxî:** Kazuko Yosbiyaki, Talsuya Fajî, Takahiro Tamura.
**Welat:** Japonya–Fransa
1978'ti Xeleya Sermiyan dê En Baş Girota



**Sermiyan: Nagisa Oshima**

**Fîlm ra yew dîman.**



Mesela ina fîlm, 1895'ti Japonya di veyrena. Yew mêrdok û cenî ya xwi estî. Mêrdek, yew fayton sero xebitiyeno (gurêneno), tikê extiyar o. Cengiya jey zî ciwan a ew zaf rinda....Cenî, hergû şew mêrdey xwi şiwena, pank kena ew money jey vilinena "saki" (şerab...) dana bide. Enî yewbînan ra heskenê....

Eyla yew roj, yew mêrdek û xort/ciwan raştê cenî yeno, hema newe eskerrey ra ameyo... Wext ra zera jîn kewna yewbîna, benê dostê cê....

Labelê nawê mêdey cenî ki beno belay sere dê jîn... Badî sekenê kenê mêrdekî kişena/ xenêqenenê û fînenê yew bîr dê kor ê....

Beyntar a yew çend serrî veyreno; eyla xeyalê mêrdekî qet çimandê jîn (waşto) ver ra nişono. Mêrdek, qûwen o hewndê jîn, quweno hewndê mileti... Şonê kora se. heze ki rastê jey genê.... Cenî û dost nêzanê sekê senêbikê....

Îna fîlm, USA (Amerika) di gasax kerdaya... Japonya di zî ancax kilm ra pey navniya ya..... Meta rojon dê sînemayan ra peyzî binavniyo...

**CEMAL PÎRANIJ**

# Çend têbinî li ser zimanê Rojnameya Welatê Me

| Hej–Rûpel | Navê babet | Peyv | A rast | Têbînî |
|---|---|---|---|---|
| 10–1 | Manşêt | Qetlîam | Tevkujî | Qetlîam bi erebî ye û ji du peyvan tê |
| | | | Qirkirin | serhev: Qetil bi wata kûştin û A'm bi |
| | | | Komelkûj | bi mana tev. |
| 10–3 | Navên bi kurdî.. | Mûnasîp | Gûncaw | |
| | | | Lebar | Bi erebî ye. |
| 10–4 | Gotinên raydarên. | Reqem | Hejmar | Bi erebî ye. |
| 10–15 | Ji Welatê Me | Esas | Bingeh | |
| | | Însan | Mirov | |
| | | Mecbûr | Naçar | |
| | | Îcab | Pêwîst | |
| | | Talûke | Metirsî | Bi erebî ne. |
| 12–2 | Rapora DYA'yê | Mesûl | Berpirsiyar | Bi erebî ye. |
| 12–8,9 | Ezîz akreyî | Sebeb | Ho, Sedem | |
| | | Mûsaît | Alîkar | |
| | | Qeder | Çarenivîs | |
| | | Tecrûbe | Ezmûn | Bi erebî ne. |
| 20–16 | Gerîlayên jîr.. | Rêheval | Hevrê | Tam li gor peyva yoldaş a tirkî hatiye çêkirin, çima **hevrê** nebe. |
| 21–15 | Ferhengok | Lêsiwar | Otombîl | Ev peyv jî çêkiriye. Li başûrê welat, ji zû ve **Otombîl** tê bikaranîn, dîsa li başûr **gerên** jî çêkirin, lê pir bi jîn nebû û mir. |

Herweha peyva muqayese pir tê xebitandin ku kurdiya wê ya resen heye ew jî **berawird** e.

**B.BAHOZ/BERLÎN**

# AZADÎ

## Doza Kurdistanê ketiye rojeva cîhanê



**ABDURRAHMAN DURRE**

Belê, doz xurt dibe, gerîla bi pêş ve diçe, beyanî xuya dike,...stêrka sibê roniyê dide...

Bi rastî jî di vê meha avrêlê de, bi hatina biharê re pîvok, gul û beybûnên derbiharê, mizgîniya dilşadî û azadiyê ji bo dilbikulan bi xwe re tînin. Bi werzabayên biharê re dimizgînin, diwezînin...

1)Televîzyona kurdî Tv–Med wekî stêrka Qurixê (Gelawejê) ji asîmanê cîhanê şewq û şemala xwe daye Kurdistanê.

2) Parlementoya Kurdistanê deng da cîhanê. Ew bû nûçeya yekemîn a medyayê.

3) Leşkerên tirkan li Başûr ketine lîl û hezekan. Êdî Serokleşkerê wan jî qebûl dike ku encam dibe wekî Vîetnamê.

4) Hemû rêzan û polîtîkavanên cîhanê dibêjin û bawer dikin ku çareseriya pirsgirêka Kurdistanê siyasî ye ne leşkerî, zorberî û barbarî ye.

5)Papa yê mezin John Paulê Duyemîn bi minasebeta Cejna Paskalyayê di hizûrê bi sedhezaran mevan û malîvanan de dibêje: "Ez ji bo gelê Kurdistanê duayan dikim, daxwaziya min ew e ku gelê kurd jî bigihîje mafên xwe û arezûyên wan ên derûnî pêk werin."

Bi rastî jî, ew dua daxwaziyeke pir mezin, girîng û dîrokî ye ku Papayê mezin ji gelê kurd re kiriye. Em li ser navê gelê kurd û Hereketa Îslamî ya Kurdistanê û Parlementoya Kurdistanê ji wî re pir pir spas dikin, hurmet û nîmetdariyên xwe jê re pêşkêş dikin.


Xwendevanên hêja,

Xwedê di Quranê de dibêje: "Di pey tengiyan re firehî ne, dê ew dem jî were ku zalim û zorbedar li ser serî bikevin." Wisa xuya dike ku êdî dema ku zalim jî li ser dev bikevin, mezlûm rabin ser xwe û azad bibin nêzîk bûye. Zereqiyên tava rojê xwe dane çiyayên Kurdistanê... Alên azadiyê wekî kulîlkên derbiharê bişkivîne, bêhn didin zozan û waran li ber devê çem û cobaran, li deşt, pal û zinaran...


Mizgîn ji we re be gelî kurdan, şad bin, dem hatiye ku em tev aza bin, dilxweş bin! Bila xaîn û cehşik jî rûreş bin, bêweş bin, bêhiş bin.

Belê, xaînên Kurdistanê bila nefekirin ku wê ew xiyanet û cehşiktiya wan a pîs û qirêj û gemarî ji wan re bimîne. Ku ew çiqas ceş bin, wê ewqas fir û faş bin. Hê ku dem heye bila tobedar bin, bes e ku ker û dewar bin, li dû neyar bin.

www.arsivakurd.org



# Qimil û Mûrî



Zarokên Kurd ên delal
We bibînim şîrhelal

Jîr û zana bin her dem
Bila dûr bin kul û xem

Bala we tim li we be
Kesek we ji rê nebe

Karê we be zanyarî
Qet nebin piç û parî

Hez bikin ji mirovan
Hez ji tab û keda wan

Qet ne xweş e kedxwarî
Wê nekin rê tu carî

Ji bo we mînak e ev
Mûrîw qimil li gel hev

Bêgotin û serêşan
Guh bidin çîroka wan

Hebû mûrîyek çeleng
Karker û bêhis û deng

Şev û roj bi xebat e
Tim biliv û lebat e

Li erd û rez û werza
Li zurik û firaza

Li diraxa û bêndera
Ew diçe hemû dera

Pale ye, palê dijwar
Ew ranaweste tu car

Geh genim geh jî buçîk
Geh ce geh genim û nîsk

Kom dike bi hewarî
Kun mûriya xwe tarî

Lê cîranek wê heye
Tim û tim di xew de ye

Ku dexil didin simbil
Nû şiyar dibe qimil

Heta ku dexil heye
Qet derdê wî tune ye

Lê ku daxil diqede
Dikeve loma Xwedê

Rojek germ e, havîn e
Dexil nû seridîne

Qimil hat bi giranî
Ser simbilêkê danî

Çi simbilê dev dayê
Pûç dike mîna kayê

Tab û keda cotarî
Tev kire ax û arî

Lê mûrî wiha nake
Lew şarezaw dilpak e

Digere li nav dexlan
Qet dev nade simbilan

Libên ku ketin derdor
Wan dibe kunê bizor

Lew ku mûrî wan berdê
Wê birizin li erdê

Qimil bin xwe re nêrî
Gelek wehîr e mûrî

Got: "Mûriya belengaz
Ji te dernayê awaz

Jiyana te binerd e
Dev ji wê rewşê berde

Te ne roj e, ne êvar
Tu qet venabî ji kar

Rûne bixwe wekî min
Bêxebat û bêkirin"

Mûrî nêriya li jor
Got: Qimilê şevekor

Bi şev û ro li kar im
Wekî te ne kedxwar im

Bi tab û xwêdana xwe
Dom dikim jiyana xwe

Bi karê giranbuha
Ser bilind im her wiha

Qey tu li xwe nanêrî
Tiral û nekir kêr î

Divê tu vî zanibî
Ne gelek sibe dûr î

Namîne germ û havîn
Wê dexil bêne çinîn

Te kar û xebat tune
Temenê te pir kin e.

**J. DILOVAN**

## NAMEYÊN XWENDEVANAN

### Weşana radyoyê

Hevalên hêja, xwedekarên Welatê Me ji we hemûyan re serkeftinê dixwazim.

Ez xwendevanekî Welatê Me me, Birêz Mazhar Günbat di hejmara 20'an de nivîsara we bala min kişand. Gelo ji me re hûn dikarin der heqê rewşa me de agahiyê bidin me? Komara tirk a barbar, hov û har da ku ji me re bûye neyar, aşîtiyê dê kengê bixwaze, tevî 50 hezar leşkerên xwe ketiye başûr ma ne bes e. Hevalê hêja ji kerema xwe re hûn dikarin wêşana radyoya Kurdistana Serbixwe û Azad bi dor firehî pêşkeşî me bikin û saet li dora çendan dest bi weşenê dike? Rê hevalno ez naxwazim serê we bêşînim û cihê rûpela we teng bikim loma ez dawî li nivîsa xwe tînim, yan na pir gotinên min hebûn.

Bimînin di xweşiyê de; ji me hemûyan re serkeftin. Ez 37 salî me, ez Welat û Welatê Me dixwînim. Ev 37 sal in ku ez li Amedê rûdinim, lê hê jî min karek bi dest nexistiye.

**Zekî Şêr**

### Dilovaniya neteweyîtiyê

Peşî rojnamevaniya we bi hemû dilovaniya xwe pîroz dikim. Di xebatkariya rojnamegeriyê, di sosretiya astengan de, ji bo we hêsaniyê dixwazim.

Dilovaniya neteweyîtiya gelê me, heta niha di nav mirin û jînê de dikire zarezar. Îro bi saya rojnamevanên wekî we, em dinêrin ku di nav gelê me de jî pêşweriya neteweyîtiyê gur û geş dibe...Bêqiyas spasdar im. Hengama me, di bin bandora çapemeniyê de ye. Serdariya komên mirovan di destê çapemeniyê de, xwe nûjen dikin û bi pêş ve dimeşin. Çapemenî her diçe û serdariya xwe û bandora xwe zexim dike. Hema hema hindik maye ku qedera hemû gelên gerdunê bikeve destê çapemeniyê. Ji kesan heta komên mirovan û heta serokên wan êdî di bin bandora çapemeniyê de dimînin. Bi rastî ji bo gelên tengezar karekî herî mezin e ku xwe bikaribin ji zordar û zordariyên sosret biparêzin.

Niha rewşa çapemeniya gelê me di nav çapemeniya dinyayê de cîhekî çawa girtiye? Dixwazim li ser vê meseleya girîng bihizirim, ronakbîr dewlemend û hemû kesên welatperwer bidim hizirandin... Rojnamegeriya me di sala 1898'an de dest pê dike. Rojnamegeriya gelê tirk di 1860'an de dest pêkiriye. Yanî bi 38 sal tenê beriya me dest pê kirine. Niha rewşa rojnamegeriya me û ya wan li ber çavan e...

**Bekirhan Yıldız**
**Amed**

### Kurd dişikên lê natewin

Dema mirov li rojhilatê dinêre, cengeke giran li ser xaka Kurdistanê dibîne. Pir xwîn li ser vê xakê hatiye rijandin. Împeryalist û kevinperestên dinyayê tevan çav berdane xaka Kurdistanê. Ji romê heya ereb û ecem bi êrîşên xwe yên li ser kurd û Kurdistanê, welatê me di nav xwe de parvekirine. Lê belê gelê kurdan di hemû deman de serihildan kirine. Ji Bedirxanan heta Şêx Seîd, Seyîd Riza û hwd. lê dijminê kurdan hov û wehş in. Di 1938'an de li Dêrsimê çem bi xwîna kurdan sor bûn. Geliyê Zîlan bi leşan tijî bû. Li Amedê di 1925'an de bi hezar xort û serekên kurdan hatin daleqandin. Ev hovîtî bi sedsalan e ku dom dike. Lê, kurdan xwe tu car li ber dijminê xwe serî netewandin.

Îro kurd bi şiklekî nû dijîn. Kurdên berê êşîr bûn, tarîqat bûn û hwd. Niha kurd yek in. Biken, bigirî, biserfirazî, bibindestiyê. Bi şer û çandeke hemdemî berxwedana xwe dimeşînin. Li hemû dinyayê, bi çavekî dinêrin, bi destekî, dixebitin, bi zimanekî diaxivin. Gava li Agirî tiving biteqe, li Munzur, li Gabar, li Cudî jî diteqe.

Bi hêviya azadî û serfiraziyê

**Azad Şîrîn / Êlih**

### Komara tirk çi da me, çi ji me stand?

Berî gotina xwe ez dixwazim tiştên ku dewleta tirka daye we rê bikim. Yezdan wê ji serê me kêm bike, wê gelek tişt dane me, qirkirin, qetlîam û asîmîlekirin....Bajar, navçe û gund şewitandine. Bombe barandine li ser mal û daristanan. Em koçber û penaber kirine. Bi darê zorê zimanê xwe, dîroka xwe, wêje û çanda xwe daye me. Gelo ji me çi standine? Bersiva vê jî gelek in. Zimanê me ji me standiye, folklora me ji me standiye û hwd. qey ne bes e? Ji xwe neteweyek bi ziman, çand, dîrok û hwd. netewe ye. Bi van yekan xwestine ku me ji eslê me bikin.

Nîjadperestekî tirk Abidin Özmen (Mufetişê Giştiyê Kurdistanê) ji bo asîmîlekirina kurdan beriya 40–50 salî hinek rê daye ber hikûmeta xwe. Û gotiye ev rê, wê derî li ber serhildanên kurdan bigirin. Çi ne ev rê?

1–Divê kurd bêne asîmîlekirin.

2–Bi xweşkayê ya jî bi darê zorê bila hînî tirkî bibin.

3–Li gundan, bila dibistanên tirkî vebin.

4–Li bajarên kurdan navendên tirkvaniyê bên vekirin.

5–Axaftina kurdî bila bê qedexe kirin û hwd.

Bimînin di xweşiyê de.

**Rûstem Yılmaz**

www.arsivakurdi.org



# JI WELATÊ ME

MAZHAR GÜNBAT

## DGM û zimanê kurdî

Vê hefteyê hem rojnameya Welatê Me hem jî rojnameya Welat ji ber hin nivîsên çapbûyî, li DGM'ê bûn. Di doza her duyan de jî me xwest ku em bi kurdî xwe biparêzin.

Heta vê gavê ji aliyê DGM'ê (Dadgeha Ewlehiya Dewletê) ve sê doz ji bo nivîsên Welatê Me, sê heb jî ji bo yên Welat hatine vekirin. Li ser navê Welat ez derdikevim mehkemeyê. Çi qas cara ku min xwestiye bi kurdî xwe biparêzim rayedarên DGM'ê nehiştine. Di danişina 24'ê avrêlê 1995'an de ji ev tewra DGM'ê neguherî feqet ji bo danişîneke din parêznameya kurdî bi wî şertî ku nivîskî be, ji aliyê DGM'ê ve hate qebûlkirin. Tevî vê yekê em baş dizanin ku ev sazî saziyeke komara rom e û bextê romê tune ye. Yanî heta danişîneke din eger DGM vê tewra xwe dîsa biguherîne, em lê şaş namînin.

Du roj piştî doza Welat, doza Welatê Me jî li DGM'ê li dar ket. Xwediya rojnameyê Aynur Bozkurt û berpirsiyarê nivîskaran yê berê Mehmet Gemsiz jî di danişînê de bi kurdî peyivîn û xwestin ku xwe bi kurdî biparêzin. Qebûlkirina vê daxwaza wan li aliyekî rayedarên DGM'ê ev tewra wan wekî tewreke siyasî bi navkirin û xestin wan tewqîf bikin.

Lê di deqeya dawî de DGM dîsa ji qerarê xwe vegeriya û danîşîn hişt roja 1'ê gulanê.

Rayedarên DGM'ê tewra kesên ku bi kurdî dipeyivin siyasî, ya xwe hiqûqî dinirxînin.

Wele bavo xweş kar e, hûn rabin zimanê gelekî ji 40 milyonan pêkhatî, lê qedexe bikin, ji ber bikaranîn vî zimanî hemû rê û metodên dijmirovî li hember kurdan bicerîbinin, tewra we nabe siyasî, lê dema kurd bi zimanê xwe diaxivin hûn tewra wan siyasî dibînin. Divê bête zanin ku di her warî de bikaranina zimanê kurd mafê herî xwezahî yê gelê kurd e, eger ev yek kirineke siyasî be, em serdanpê siyasî ne.

Em hemû kurd û saziyên kurdan yên ku ji ber dîtina xwe têne darizandin, dawet dikin ku xwe ji zimanê xwe pêştir, bi zimanekî din neparêzin. Eger ev kirin siyaset be, gerek e hemû kurd dest bi siyasetê bikin.

# Çima hûn ji xwe napirsin?

Li pêş me rojên germ û rojên girîng hene. Dijmin ji her aliyî ve tê ser gelê me. Çiqas metod û hovîtî hene bi kar tîne. Ev 70 sal e ku gelê kurd, di bin zordestiya KT'ê de dinale. Gelê me pir caran serê xwe rakiriye, lê mixabin bi xwîn û jenosîdan, bi xayintî, dijmin dawiya serhildanan aniye. Rewşenbîrên kurdan jî vala nesekinîne. Li ser ziman, dîrok, çand û hunera kurdan xebitîne. Lê negihîştiye mejiyê gel. Bi kurtî kurdên bakurê Kurdistan, heta çend sal berê ji pir tiştan mehrûm mane. Îro em li rewşa welêt mêze dikin, tu fersendekî wisa neketibû destê wî.

Êm çawa dikin? Deh sal berê me lê ba hevdu nikarîbû bi zimanê xwe xeber bide. Em li rojnameyekê digeriyan, bila navê kurd tê de derbas bibe. Niha rojname heye, gelek pirtûk û kovar derketine, ji her tiştî xweştir, ew rojname, pirtûk û kovar bi zimanê kurdî tên weşandin. Incax ez bawer nakim ku ew weşan bi têr bên xwendin. Rojekê em li ser xwendin û nivîsandina zimanê xwe bisekinin, ji me re mîna barekî giran tê. Em zû aciz dibin. Mîna rewşenbîrên burjuwaziya biçûk hinekî em dibêjin: "Bila her tişt amade bê pêş me."

Ma em nabînin ku welat ji her alî ve di nav xwînê de maye. Çiyayên me serî hildane, daweta şoreşê dikin. Gel bi hêvî bi wan çiyan ve xwe girêdaye. Hinekî me ji rûniştine ji wan bûyerên rind re çepikan lê dixin û ji yê ne rind re ji "ax û of...." dikşînin.

Rojname, kovar, pirtûk dertên, mirovan bi çi cefayî keda xwe xerc dikin, heta pêşiya me tînin ên me jî dibêjin: "Wela heval anlamıyorum." (nikarim fêhm bikim). Kekê min heta êvarê tu ax û of êdikşînî, heta sibehê tu çepikan lêdixî. De bixebite, li ser zimanê xwe li ser pirsgirêkên xwe, bixwîne, binivîse, bi zimanê xwe bipeyive. Mîna meseleyeke me li jêr gotiye, ev bar barê me hemûyan e, me li kijan aliyî girt bi evîn û bi hêvî wî barî emê rakin.

Çend sal berê grubek gerîla diçin gundekî. Heta nîvê şevê bi gundiyan re dipeyivin. Gundî pir kêfxweş dibin. Hinek daxwazên gerîla hene, gundî ew tiştan temîn dike û dide gerîla. Gerîla xatir dixwaze ku êdî herîn. Şervanekî keçik tê wî barî radike ser milê xwe. Lê bar hinekî giran e. Gundî jî kom bûne li şervanan temaşe dikin. Dibînin ku şervanê keçik tenê ew barê gran rakir. Ji nav gundiyan de merivek gazî dike:'Ma hûn fedî nakin. Heta niha hûn ji me re dibêjin wekhevî, azadî hûn wî barî giran datînin ser milê keçikê ew dikare wî barî rake?'

Gerîlaya keçik bersiva gundî dide:" Xalo, ew bar ne yê wan e hûn pênc mirov kom bûne, li min temaşa dikin. Çima hûn ji xwe napirsin? Ev bar yê we ye."

Em li cihê xwe rûnin, roj bi roj emê genî bibin. Her tişt hazir nayê ber me. Niha bi hezaran şehîdan canê xwe dane ji bo vî welatî, negotine: "Of". Gerek e em jî layiqî wan bin, xebata xwe bi pêş ve bibin.

Îsal sala Ehmedê Xanî ye, rastbûna hesreta Xanî pir nêzîk bûye. Em ji vê salê li gorî hesreta Xanî bixebitin û binirxînin.

**RONÎ JÎR**

## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

**Min Welatê Me Divê**

| | Li Hundir | Li Derve |
|---|---|---|
| ☐ 3 Meh | ☐ 550.000 TL | ☐ 45 DM |
| ☐ 6 Meh | ☐ 1.000.000 TL | ☐ 80 DM |
| ☐ 12 Meh | ☐ 1.800.000 TL | ☐ 150 DM |

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

**NAV Û PAŞNAV** : ..............................
**NAVNÎŞAN** : ..............................
..............................

**Navnîşana Welatê Me**
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
**Tel–Fax:** 293 53 19 – 245 29 91

# Dinya, Tirkiye û Kurdistan

Dinyayê, pîştî "Serê Sar" gûherandineke mezin derbas kir. Ev guherîn, li hinek dewletan pêşketinin mezin deranîn holê, li hinek dewletan jî kaos û tevlîheviyeke mezin. Gelek dewletên di nav "Yekîtiya Sovyetê" de serxwebûna xwe îlan kirin. Li dewletên Rojhilata Ewrûpayê, rejîm guherîn. Li aliyê dîn, li gelek dewletên din vê yekê tesîrên pir giring kirin. Gelek aştiyê heremî çê bûn. Aştiya Filistîn û Îsraîlê, ya IRA– Îngilistanê, li hevhatina Zencî û Spiyê Afrîkaya Başûr û hwd.

Piştî "Şerê Sar" li Tirkiyeyê û Kurdistanê jî pir tişt gûherîn û rewşeke nû derket holê. Tirkiyeyê, armancên gelek mezin danîn pêşiya xwe. Xwest ku, li Kafkasyayê dewletê Tirkiyan (Azerbeycan, Kirgizistan, Turkmenistan, Kazakistan û hwd.) bixe bin tesîra xwe. Bi wan re têkiliyên aborî û siyasî yê xurt li darxe. Dawiyê jî bikeve nava "Gumruka Yekitiya Ewrupayê. Lê heta pirsgirêka kurdan neyê çareserkirin Tirkiye nikare pirsgirêkên xwe çareser bike û li dinyayê ji xwe re cihekî bigire.

Gava mirov bala xwe bide ser bipêşketinin dinyayê yên nû, mirov, siyaseta Komara Tirk (TC) ya kevinperest û dûrî baş dibîne. Ew xwe nade ber tu riyên çareserkirina siyasî. Kesên ku behsa aştî û biratiyê bike ya xwe li girtîgehê ya jî li goristanê dibîne. Yek siyaseta KT'yê heye! Zor, zilm û înkar! Lê dinya bipêşve diçe, statûkoya berê belav dibe. Terorîstên do, îro serokên dewletan in, nûnerê xelkê xwe ne. (Nelson Mandela– Yaser Arafat, Gerry Adems û hwd). Ewê di statûkoyê de israr bike û ya xwe neguherîne wê belav bibe. Li gelek dewletên dinyayê gelên cur be cur bi hev re dijîn. Bi biratî û aştiyê. Lê ji bo yekîtiyên wisan jî, gereke wekhevî û demokrasî hebe. Gava wekhevî û demokrasî tûnebe, ne aştî û ne biratî dimîne. Şer û dijminî dertê pêş.

**SMAÎL DILÊR**

**WELATÊ ME**
Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
**Aynur BOZKURT**
...............

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
**Mazhar GÜNBAT**
...............

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazıişleri Müdürü)
**Metin AKSOY**
...............

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
**Suut KILIÇ**
...............

Redaktor
**Sami TAN**
...............

**NAVNÎŞAN (Adres)**
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL–FAX**
293 53 19 – 245 29 91

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÛNERÎ**
(Temsilcilikler)

**Suriye**– Jan Dost
Fener Rojbiyanî
**Berlin**– Silêman Sido
Sîrwan Reşîd
49-30-69 00 26 95
**Bonn**– Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
**Hannover**– Selîm Biçûk
49-5721-813 60
**Hamburg**– A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
**Munchen**– Mahmut Gergerli
49-871-670 884
**Badenwurttenberg**–
A. Rahîm Ayaz
49-75453258
**Swed**– Amed Tigris
46-8-740 69 81
**Amsterdam**– Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
**Paris**– M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
**Atîna**– Ferhan Zêbarî
30-13634905
**Bruksel**– Medenî Ferho
32-16-49 07 67

www.arsivakurd.org

## Ji çapemenî û gelên dinê re!

Em zarokên kurdan bi dilgeşiyeke mezin zarokên dinê silav dikin. Em li bang hemû xwişk û birayên xwe dikin; bila li dijî vî şerê qirêjî ku li welatê me dom dike, derkevin. Em zarokên kurdan in, em zarokên welatê ku gundên wî tên şewitandin, çiyayên wî tên bombekirin, bi top û mayinan tê parçe kirin in. Wekî her zarokî em jî dixwazin dilşad bibin. Em jî dixwazin wekî zarokên dinê bextewer bibin. Em dixwazin dê û bavên me, xwişk û birayên me neyêne kuştin. Bila bi malbatên me îşkenceyê nekin, bila me ji cihên me nekin. Em şer naxwazin, aşitiyê dixwazin, werin em dest bidin hev. Ev dinya ya me tevan e. Azadî ji bo me hemûyan e.

23 Nîsanê cejna zarokan e, ji ber vê yekê daxwaziya zarokên kurdan ev e ku, bi nasnameya xwe ya neteweyî û bi zimanê xwe di şahiyê de li zarokên dinê silavan bikin. Em zarok in. Di dilê me de cihê şer û pevçûnê tune ye. Em zarokên kurdan dixwazin ku her dem bi hevalên xwe yên dinê re di nava aşîtiyê de bileyizin û staranan bibêjin. Ma çima em vê cejnê jî, bi hev re pîroz nekin? Em dixwazin di cejna 23'ê Nîsanê de hemû zakokên dinê hembêz bikin. Bila di nav zarokan de hezkirin, biratî û aşitî aj bide. Em zarokên koroya Navenda Çanda Mezopotamyayê –Gulên Mezrabotan– silavên xwe pêşkêşî hemû zarokên dinê dikin. Heke ku destûr nedin me û nehêlin em derkevin vê şahiyê dîsa jî em cejna zarokên tirk û yên dinê pîroz dikin.

Zor spas.



ZAROKÊN KOMA GULÊN MEZRABOTAN:

# 'Dema welatê me azad bibe, emê bi zarokên tirk re bileyizin'

Li Enqereyê roja 23'yê avrêlê gelek dîmenên lecêp û balkêş derketin holê. Li aliyekî zarokên dinê ji bo cejna zarokan (23 avrêl) hatibûn dawetkirin û zarokan bi stran û lîstikên xwe yên neteweyî cejna xwe pîroz dikirin. Li aliyên din jî, ji zarokên kurd re destûr derneket ku ew jî wekî zarokên din, bi stran û lîstikên xwe beşdarî cejnê bin.


Li ser vê yekê me dîtinên zarokên koroya Gulên Mezrabotan û berpirsiyara wan Şevîn Civaknasê standin. Zarokên koroyê (50 zarok in) ji me re gotin: "Muraceata me, nehate qebûlkirin. Lê em ji zarokên tirk naxeyidin. Dema welatê me azad bibe, emê wan dawetî cejna xwe bikin." Berpirsiyara koroya zarokan Şevîn Civaknasê jî li ser mijarê got: "Ev çar sal e em jî ji bo beşdariya cejnê muraceat dikin. Lê serîlêdana me nayê qebûlkirin." Pişt re jî got: "Îsal jî me ji bo beşdariya cejnê muraceatê Serokkomar Süleyman Demirel, Serokê Meclîsê Hüsamettin Cindoruk, Wezîriya Çandê û Wezîriya Mafên Mirovan kir. Lê me ji wan tu bersiv nestandin û muraceata me ne hate qebûlkirin. Em jî ji bo beşdarî û hevdîtinê çûne Enqereyê û me xwest ku em bi Serokê Meclîsê Cindoruk re biaxivin. Lê wî em qebûl nekirin. Piştî vê yekê koma me li bexçeyê meclîsê daxuyaniyek xwend. Di destê zarokên me de dovîzê (pankart) wekî, "Zarokên dinê hûn bi xêr hatine, "Em ne bombeyan, şekir dixwazin," "Bi zimanê xwe yê zikmakî em perwerdeyiyê dixwazin," "Ne dijmintiyê, em biratiyê dixwazin," "Em jî dixwazin bi we re bilîzin." Piştî xwendina daxuyaniyê zarokan li bexçeyê strnên xwe "Lezkin û Biratiya Gelan" (Halkların Kardeşliği) gotin. Piştî staranan em li otobusa xwe siwar bûn û hatin."

Yekîtiya Malbatên Mezopotamyayê jî piştî ku muraceata zarokên wan nehate qebûlkirin gotin: "Em naxwazin ku di nava gelê kurd û tirk de dijmintî çêbe. Em zarokên xwe teşwîkî biratiyê û dostaniyê dikin. Em aştiyê dixwazin. Zarokên me jî ji bo aştiyê xwestin ku beşdarî cejna zarokên tirk bibin. Bi wan re bibin heval û stranên aştiyê bibêjin. Em ji dayikên tirkan re bang dikin, bila ew jî li dijî şerê gemarî derên û dengê xwe bilind bikin û ji bo biratiya gelan bixebitin."

ÎSMET ÛSIF

### elinewêrek




www.arsivakurd.org